# WÊJEYA KURDÎ

AMADEYÎ

3

## AMADEKARÊN PIRTÛKÊ

### *Komisyona Ziman ya berê pirtûk amade kirîn*

*M. Mele Elî DEMIR, M. Şîrîn ÇETİN, Mazlum TEKIN*

### Komisyona Nûvejenkirina Pirtûkê

M. Şîrîn ÇETÎN, M. Mazlum TEKÎN

### *Mîzanpaj*


*Bedredîn OY*

**Ev pirtûk; ji aliyê Desteya Perwerde û Fêrkirinê ve,**

**weke pirtûka waneyê hatiye pejirandin.**

**Email: s.m.kurdi2014@gmail.com**





"Bêguman emê wêjeya demê Neolotîkê pêkbînîn."

Rêber APO

# NAVEROK

WÊJE ... 9
DÎROK Û GIRÎNGIYA WÊJEYÊ ... 10
TAYBETMENDIYÊN WÊJEYÊ ... 10
MIJARÊN WÊJE BIKARTÎNE: ... 11
TÊKÎLIYÊN DI NAVBERA WÊJE Û ZANISTÊN DIN DE: ... 11
CUDABÛNA WÊJEYÊ JI ZANISTÊN DIN YÊN CIVAKÎ ... 12
CÛRÊN WÊJEYÊ ... 12
PÎVANÊN BERHEMÊN WÊJEYÎ ... 13
HERIKÎNA WÊJEYÊ ... 14
WÊJE Û GIRÎNGIYA WÊJEYÊ ... 16
REWŞA WÊJEYA KURDÎ DI SEDSALA XIX'AN DE ... 19
KLASÎZMA KURDÎ ... 21
HELBESTA MESTURE KURDISTANÎ ... 23
DAXUYANÎ ... 25
JÎNAMEYA MESTURE KURDISTAN ... 26
PÊŞKETINA WÊJEYA KURDÎ DI SEDSALA XIX'AN DE ... 29
HETA KU LIHEV NEYÊN QEBÎLÊN KURDAN ... 31
JÎNAMEYA HECÎ QADIRÊ KOYÎ (1825-1897) ... 33
HELBESTA ŞÊX RIZA TALABANÎ ... 36
JÎNAMEYA ŞÊX RIZA TALABANÎ ... 37
HELBESTA WEFAYÎ ... 39
JÎNAMEYA WEFAYÎ ... 41
HELBESTA ŞÊX MIHEMED KERBELAYÎ ... 43
JÎNAMEYA ŞÊX MIHEMED KERBELAYÎ ... 44
ROJNAMEYÊN DESPÊKÊ ... 50
HELBESTA PÎREMÊR ... 52

JÎNAMEYA PÎREMÊR .......... 54
HELBESTA CÎHAN ARA XANIM .......... 56
JÎNAMEYA CÎHAN ARA XANIM .......... 58
JÎNAMEYA NÛRÎ DÊRSIMÎ .......... 60
HELBESTA NÛRÎ DÊRSIMÎ .......... 60
HELBESTA CELADET BEDIRXAN .......... 63
ALA KURDAN .......... 63
JÎNAMEYA CELADET BEDIRXAN .......... 64
4.HELBESTÊN PASTORAL .......... 66
WÊJEYA KURDÎ DI SEDSALÊN XX’AN DE .......... 68
HELBESTA CEGERXWÎN .......... 70
JÎNAMEYA CEGERXWÎN (1903-1984) .......... 71
HELBESTA OSMAN SEBRÎ .......... 73
DÎCLE Û FIRAT .......... 73
JÎNAMEYA OSMAN SEBRÎ .......... 74
HELBESTA GORAN .......... 77
ÇÎROKA BIRATIYÊ .......... 77
GORAN(1904-1962) .......... 78
HINEK KOVAR Û ROJNAMEYÊN KURDÎ .......... 80
HELBESTA QEDRÎCAN .......... 82
JÎNAMEYA QEDRÎCAN .......... 84
GULA SOR .......... 86
HELBESTA CASIMÊ CELÎL .......... 88
SINGA ÇIYÊ .......... 88
JÎNAMEYA CASIMÊ CELÎL .......... 89
HELBESTA HEJAR .......... 91
KURD BÊKES NÎNE .......... 91

JÎNAMEYA HEJAR....................92
HELBESTA KAMURAN ELÎ BEDIRXAN....................94
XATIR XWAZIYA MEMÊ....................94
JÎNAMEYA KAMÛRAN ELÎ BEDIRXAN....................96
KOVARA HAWAR....................98
SIRÛDA DILDAR....................99
EY REQÎB....................99
JÎNAMEYA DILDAR....................101
HELBESTA TÎRÊJ....................103
EY WELAT....................103
JÎNAMEYA TÎRÊJ....................104
HELBESTA MELE HESEN....................105
AWAYÊ EVÎNÊ....................105
JÎNAMEYA MELE HESEN....................106
HELBESTA KURDÎ....................107
GOTINA MUSA ANTER....................108
JÎNAMEYA MUSA ANTER....................108
HELBESTA MIHEMED ŞÊXO....................111
WELATÊ MIN....................111
JÎNAMEYA MIHEMED ŞÊXO....................112
TÊKILIYA WÊJEYA KURDÎ Û WÊJEYA CÎHANÊ....................113
ŞILLÎ....................115

## WÊJE



Wêje, mirov hest û ramanên xwe bi zimanekî xwe yê xweşik û girêdayî desturên estetîkê bi nivîskî yan devokî anîna ziman e. Wêjeyê jî rêbazek ya xwe heye; ew jî zaniest e. Ji ber ku wêje li şûna zanistê wate, şirove, nirxandin, mînandin, bicihkirin û beramberkirinê çêdike, zanistek e.

Armanca wêjeyê estetîk û xweşik bûne. Taybetmendiyên bingehîn yên wêjeyê:

1. ***Ziman –uslub***
2. ***Estetîk - xweşikbûn***

   Ev her du jî li gor kes, xwendevan û nivîskaran tên guhartin.

   Ji bo em bikaribin hest û ramanê xwe, ji yê li hember xwe re bidin têgihandin, wêje amêrek ya kêrhatiye.

   Wêje ji naverokê zêdetir, girîngiyê dide çawa têgihandina naverokê.

## Dîrok û girîngiya Wêjeyê

Ji zanista berhemên ziman yê nivîskî û devokî yê neteweke bi deman re afirandî, her wiha nivîskarê wê bi zanistî di herikîna dîrokê de lêkolîn dike re dîroka wêjêyê tê gotin.



Dîroka wêjeyê çêbûna ramanên neteweke yê demê bûrî, têgeha wê ya li Cîhanê, şarezayiya çandî û mirovahiyê ji nifşê nû re radigihîne. Bi vî awayî pirekê di navbera nifşan de, ava dike û bi riya wê ji bo nifşê nû başî, rastî û xweşikbûnê peyda bikin, dibe alîkar.

## Taybetmendiyên wêjeyê

- Berhemên wêjeyî divê xwendevanên xwe bandor bike.
- Divê şiroveyek xweş, hizirînek rêkûpêk û hêja be.
- Divê mijar, taybetmendiyên demê nivîsînê û yê civaka xwe bide pêhesîn.
- Piştî berhem ji parzûna demê derbaz bibe, divê ji aliyê civakê ve bê têgihandin û hawêj kirin.
- Divê hest û raman, girêdayî cûre wêjeyek tekuz bê têgihandin.

- Divê berhem di nava pîvana estetîkê de, bi têgehek diyar ya hunerê bê nivîsandin.

## Mijarên wêje bikartîne:

***1.Ceng***
***2.Penaberî û karesatên xwezayî***
***3.Guharînên çandî***
***4. Evîn û evîndarî***
***5.Xweza***
***6.Hemû hestên girêdayî mirovan***

## Têkîliyên di navbera wêje û zanistên din de:

***1.Civaknasî:*** civaknasî, zanistek civakî ye. Bûyerên di civakê de çêbûyî ji berhemên wêjeyê re dide pêhesîn. Civaknas jî bi vê rêbazê digihine bûyerên civakî. Berevajiyê wê jî dibe.
***2. Dîrok***: Dîrokzan bi temaşekirina berhemên wêjeyî, dikarin agahiyên demê nivîsîna berhemê bi dest bêxin. Mercên jiyana wê demê peyda bikin.
***3.Derûnasî***:Derûnas dikarin di berhemên wêjevanan nivîsandî de lêkolînên derûnasiyê pêkbînin.
***4.Erdnîgarî***: Erdnîgarnas dikarin di berhemên geryanameyan de taybetmendiyên erdnîgariyê bibînin.

## Cudabûna wêjeyê ji zanistên din yên civakî

1.Afrênerî
2.Neyekserbûn
3.Çêkirîbûyîn

## Cûrên wêjeyê

1.Helbest
2.Çîrok
3.Dram
4.Efsane
5. Taqîkirin
6.Roman
7.Serpêhatî
8.Şano
9.Gotar
10.Jîname
11.Jînameya xwe xweyî
12. Rexne
13. Bîranîn
14. Geryaname
15. Destan
16.Pêkenok
17. Helbestên şînî
18. Helbestên dilşewat
19.Helbestên Dîwanî

## Pîvanên Berhemên wêjeyî

1.Çêbûna berhem digre dest (Hûnandî, pexşan)
2.Bikaranîna Ziman
3. Awayê ravekirinê
4.Uslub
5.Awayê karanîna di berhem û hunerê wêjeyî de
6.Meznahiya berhem
7.Hilbijartina mijarê
8. Qiraça nêrîna hunermend

**LÊKOLÎN**

1. Taybetmendiyên wêjeyê yên bingehîn kîjanin û çima?
2. Mijarên wêje bikartîne kîjanin?
3. Li gor xwe wêjeyê şirove bikin.

**XEBATÊN AMADEKARIYÊ**

1.Hûn girîngiya wêjeyê ya di pêşketin û bilindibûna mirovahiyê de dizanin.

2.Pêwîstiya civakê di jiyana rojane de çiqasê bi wêjeyê heye?

## HERIKÎNA WÊJEYÊ



Ka çawa dîrok, bi peydabûna nivîsînê tê despêkirin, her wisan ahengî û rêkûpêkiya nivîsînê jî bi wêjeyê tê despêkirin.

Mirovan, ji bo hest, raman, daxwaz û hêviyên xwe bi awayek rêkûpêk ji yê li hember xwe re bide têgihandin, serî li pêkanîna wêjeyê dane.


Wêje, xemladin û ciwaniya zimanê nivîskî û devokî ye. Bê guman li cem axaftina ciwan, girîngiya nivîsandina ciwan jî gelek mezin e. Ka çawa axaftina ciwan li ser kesên derdor bandorek baş dihêle, ciwan peyvîn jî bandorê li ser destnivîsîna me ya di name, têbînî û hwk. dike. Xweş xwendin û ciwan nivîsîna me, bandorekê erênî li ser derdor çêdike.

Bêguman, awayê vegotinê çendî xweşik be, nikilê pênûsa aferîner çendî bikêr be, hestan bilerizîne, têgihandinê zêde bike, baldar be, ewqas nivîsîn xweşik dibe û ciwaniya xwe

diyar dike. Lê di heman demê de, wêje, wêjevanê xwe li hember hemû zoriyan diparêz; di dilê mirovan de şirîn dike û li gel vê yekê aloziyên jiyana mirovahiyê jî pak dike.
Dewletên sitemkar tim civak, bi jiyana rojane û ji rewaniyê zêdetir bi heyberî ve girêdan e.  Armanca wan ew e ku derfet nebe kesek li ser hizir, raman û wêjeyê bihizire û xwe pêşbêxe. Ma gelo, ger tu gulek û xwarinê deynî ber kesê birçî, wê despêkê dest bavêje xwarinê yan gulê?
Her çi qas ciwaniya gulê bê zanîn jî lê kes neçarê xwe jiyankirinê ye. Mercên jiyanê ew qas hatine teng kirin; mejî êdî bes dikare jiyana rojane bihizire. Li gor dagirkeran civakek çi qas paşketî, ji çand û wêjeyê dûrbe; vexwarina xwîna wê civakê jî ewqas hêsan e.
Weke Rêber Apo dibêje: “Eger perdeyên nezanînê bi ser jiyana civakî de nekin, sîstemên hegemonîk nikarin dewam bikin.”
Nexwe ji bo civak bikare xwe baş bîne ziman, tiştên kesek dihizire, bikare be, bi awayek serkeftî ji derdorê xwe re bide têgihandin pêwîstiya wan bi wêjeyê heye.
Wek tê zanîn wêjeya ku bi herikîna demê re hatî afirandin, her ku diherike, ciwan dibe û bandore xwe di nav civakê de zêdetir dike.

**LÊKOLÎN**
1. Wêje çawa di nava civakê de pêşketiye?
2.Rêbaza herî serketî ya hevdu têgihandinê çiye û çima?

## Wêje û Girîngiya Wêjeyê



Ji bo baş têgihandina ziraviyên wêjeyê û bandore wê ya di nava civakê de bizanin, divê wêjeya kesayetên pêşeng lêkolîn bikîn. Ger em li dîroka wêjeya xwe binêrîn, emê bi dehan kesayetên navdar ku wêjeya wan ya xweşik û rêkûpêk û di asta herî jor de ye bibînîn. Baba Tahirê Hemedanî, Elî Herîrî, Melayê Bateyî, Melayê Cizirî, Feqê Teyran, Ehemdê Xanî, Celadet Bedirxan, Cegerxwîn, Musa Anter û Rêber Apo çendek ji wan e.

Kesên baş perwerde dîtîn, wêjeya wan ya axaftinê birêkûpêk e. Perwerdeya baş bes di jiyê biçûk de ji malbat yan jî dibistanê tê girtin, wek fêrbûnek xirab di jiyê mezin de sererastkirina wêjeyê jî zehmet e.

Di roja me ya îro de tişta herî lê tê gerandin, axaftina rast û xweş e.

Di serî de rêveber û mirovên kar, kesê dixwazin di karê xwe de serkeftî bin; dikin armanc ku wêjeya xwe baş bikarbînin. Di axaftin û nivîsînê de hewldide ku wêjeya wan bigihe pileyek bijartî, di vê riyê de hewldanan zêde dikin. Ji bo bi bandor, xweş, rast û durist baxivin, pêwîstiya wan bi wêjeyê heye. Di avakirina civak û netewan de rolek girîng û diyar ya wêjeyê tê dîtin. Asta pêşketina her civakekê, di aliyên zanistî û beşên din de bi asta wêjeyê ve girêdayî ye.

Di Rojhilata Navîn de her çiqas civak hatibe vekolînkirin jî lê kariye pirsgirêkên civak û kesan çareser bike. Bi taybet di aliyê çareserkirin, naskirin û dahûrandina civaka Kurd de lewaziyên ji dil, jiyan dikin.

Birêz Ebdulah Ocelan di lêkolîn û nirxandinên xwe de cihekî berfireh daye kesayet û civaka Kurd, Rojhilata Navîn pir baş vekolîn kiriye. Lêkolînên seretayî li ser kesayeta Kurd di malbat û sîstema ku têde hatiye perwerdekirin, girtiye dest û dahûrandiye. Sîstem û desthilatdariyên paşverû yên ku Kurdistan dagirkirine, her yekî perwerdeyeke li gor xwe dane. Kesayetek li gor xwe avakirine, şopên binpêkirin û bişaftinê hêj niha tên dîtin.

Rêber Apo jî wisa dinirxîne: “Jiyana civakî tevî ku têgîneke gelekî hêsan e jî weke têgîna bingehîn ya tevahiya zanistan tê dîtin. Em nizanin jiyana civakî çi ye. Eger me zanîbûya, em ê bibûna parêzvanên jiyana xwe ya civakî ya di bin sîstemên hegemonîk de hatiye parçe kirin. Di jiyana civakî ya îro de

ne zanyarî, nezanîn serwer e. Ji xwe di benda dijberê jiyana hegemonîk de jiyaneke nezanistî heye.”

Ji bo ku em bikaribin vê rewşê derbaz bikin, divê em xwe zana bikin û pêşbêxin. Riya herî serkeftî ya bi dest xistina zanist û pêşkeftinê wêje ye.

**LÊKOLÎN**

1. Nezanîna di nava civakê de dibe sedema kîjan karesatan?
2. Ji bo ku em bikaribin zanabûnê di nava civakê de bidin rûnandin, divê em çibikin?

# REWŞA WÊJEYA KURDÎ DI SEDSALA XIX'AN DE



Weke tê zanîn civakbûyînek ya netewa Kurd ji dîrokê ve heye. Ji berê ve xwedî xet, nivîsandin û çandê ne. Mil bi milê netewên din, ji bo pêşxistina wêje, çand û zanista xwe pêngav avêtine.

Lê belê piraniya cih û warên wan yên dîrokî ji ber derbazbûna demê û guharinên li Cîhanê bi taybet piştî îslamê bandora Ereban ji holê rabûne. Li ser wêjeya Kurdî ya kevnar gelek wêjevanan nêrînên xwe anîne ziman.

Beşa Tewratê ya bi zimanê Hexamenişînî hatiye nivîsîn dabaşa zagon, xwendin, nivîsîn û çanda Medan dike. Li gorî van belgeyan derdikeve holê ku li Kurdistanê nivîsîn, xwendin, rojname, dadgeh û dadgerî hebû. Her wiha xwediyê ziman, wêje, zanyarî û çandê bû û çavkaniya pêşketinê ya çand û hûnerê. Ev çand û wêjeya kevnar her çiqas bi gelek pêlên bişaftin û qirkirinê re rû be rû mabe jî ji bo xwe biparêze, tim di nava hewldanan de maye.

Pêşketinên wêjeya Kurdî li bajarên Kurdistanê yên mezin yên weke; Amed, Bidlîs, Wan û bajarên dinên ku Kurd têde dijiyan, di aliyê olî tore, destgehên civakî, tenduristî, endustriya ji aliyê çandî, bazirganî û sazûmaniya hûnerî de gihandine astek bilind ya pêşkeftinê.
Ev yek jî diyar dike ku çanda Gelê Kurd, gavên mezin pêş ve birine. Bi taybet di bajarên Xan û Mîran de mizgeft, dibistan, fêrgeh û wanexaneyan de, ji sedsala **XIX**’an û pêde pêşketiye. Mirovên zana û zanyar ji nava van wanexaneya derketine holê. Di van wanexanan de zanistên Xudanasiyê, Cîhanasiyê û wêjenasiyê binivîsandin dihatin fêrkirin.
Bi vê boneyê gelek Mela û pîrên Kurdan yên sedsala **XIX** û pêde xwedî çandekî wêjeyî ya Kurdewarî ne.
Pêşkeftina vê rewşa he, dide nîşankirin ku di Kurdistanê de êdî li hemberî dagirkeriyê demê serhildanên gelî hatiye û çanda Gelê Kurd êdî pêşvetir biçe û derfetên derketina hûner û wêjeyê bêne afirandin. Ev sedsal bûye despêkirina pêşxistina wêje û serhildanên gelê Kurd.

**LÊKOLÎN**

1. Li gor belgeyan nivîsîn û wêjeya Gelê Kurd ji kengê ve bûye mijara rewşenbîrên Cîhanê?
2. Rewşa wêjeya Kurdî di sedsala XIX’an de çawa bû?

## KLASÎZMA KURDÎ





Ji ber sedema êrîşên dagirkeran yên li ser Kurdistanê dihatin pêkanîn, berhemên wêjeyî û zanistî û her wiha nivîskar û zanyarên Kurd jî bê ewlekarî diman. Ji ber ku berhemên gelek ji wan belgeyên li ser jiyana wan nehatine nivîsandin û parastin, ev bûye sedema windabûna gelek berhemên wan. Zanînên di derbarê jiyana wan de piranî di zargotinê de mane. Lê ji ber ku Kurdistan dagirkirî û mêjûkdar bû, dagirker û mêjûkdarên Kurdistanê, hunermend û hozanvan çewisandîne, neçarkirine ku bi zarên dagirkeran hunerên xwe birêjin, di heman demê de Kurdiya wan jî mandêl kirine û ev wêjevan û berhemên wan jî weke wêjevan û berhemên xwe dana nîşadan. ***Mînak:*** Selahedînê Eyûbî, Îbnû Esîrê Cizîrî, Feqe Hisênê Bateyî, Îbnû Xeltan û...

Lê belê wek me li waneya derbaz bûyî de dayî diyar kirin; ji nîvê sedsala xıx'an û pêde lêgerîn û lêkolînên li ser wêjeya Kurdiya nivîskî despêkiriye.

Ji van lêkolînerên xwedî berhem:

1-Aleksandr Jaba, Balyozê Ros li Erzirûmê di nîvê sedsala xıx'an de weke Rojhilat nasekê Kurd hat naskirin. Gelek

destnivîsên Kurdî komdike û dişîne Akademiya Rosî ya li Pêtegorgê. Di nav wan destnivîsan de destnivîsên Rêzimana Kurdî, folklorî, mêjû û wêjeyî jî hene. Di nav wan belgeyan de, 12 hozanvanên Kurd hene.
2-Dîtil : Di nîvê sedsala xıx'an de, zanyarê Rosî Dîtil, di xebata xweya binavê "Rêbarî" di Rojhilat de di rojnameyek Rosiya sala1848'an de nivîsiye û gotiye: "zimanê eşîrên Kurdan kêm hatine lêgerîn. Wêjevaniya devokiya wan gelek dewlemende, nîvê wê xwerûye, nîvê din jî ji zimanê Farisî wergerandiye."
Ka çawa gelê Kurd mîna gelên din pêşve çûye û bûye hevparê afirandina çanda cîhanê. Bi lêgerîn peydakirin û pêşveçûna wêjeya Kurdî ve xerîkbûye û kariye di derbarê gelek nivîskar û helbestvanên Kurd de serpêhatiya bîne berçav.
Ji ber ku di çerxa XIX'an de, dagirkerên Kurdistanê bi hev re û bi derdorê xwe re, di nava dijîtiyekê de ne, bi vê boneyê Kurdan derfet dîtiye ku çand û hûnera xwe pêşbêxin.

**LÊKOLÎN**
**1.** Aleksandr Jaba kî ye?
**2.**Çima lêkolînerên Rûs wê demê li ser çanda Kurdî lêkolîn kirine?

## HELBESTA MESTURE KURDISTANÎ

**Xusrewim wehar, Xusrewim wehar**
**Ya şa nebûwe îmsal newehar**

**Ber neyan, we ber gulan ce gulzar**
**Nekro dirext şikofe îzhar**

**Ne sehn çemen, newano bilbil**
**Henî ne nîşo jale ne rûy gul**

**Nilûfer ta heşr, ber ne yoce aw**
**Ce rûy gul surx nekêşî gulaw**

**Wenewşe û sumbul, nesrîn û şewbo**
**Ta qam qiyam berneyan ce ko**

**Susen û lale, re'ina û gulezerd**
**Henî sewz neban çenî soz û derd**

**Axem! Qumay merg didey, şehlay to**
**Yaşa kes nêrgiz nekro we bo**

**Bigêro we des, her kes desey gul**
**Wêney nêş xar bipêkoş ne dil**

**Qeyqehey kebkan, neyo ne kosar**
**Nereng gul bo, ne bezm gulzar**

**Berejo suweyl, îmsal çon salan**
**Reng sûr berg newhalan**

**Pey çê, xusre û bend ne toy mezaran**
**“Mesture” ce seyr wehar bêzaran**

## DAXUYANÎ

Wate: Ey Xusrew! Ya Xuda bila îsal bihar neyê û dar û ber nebişkivin. Bilbil li mêrg û çîmenan nexwîne, li ser gulan rûnene û lîlûper (Nilûfer) heta roja dawî di nav avê de dernekeve. Binewş, nesrîn û şewbo her sê jî şîn nebin. Ji gula sor, gulav neyê girtin. Bila leşker û sîpayê gulan pest û birçûk bin, di nava çîn û lalê de jî bila her tim rêyên zer bin û dilê wê tejî xwîn be. Bila lezîna bayê bakur ji nav çîmen dernekeve û bi taybet gulên ce'îferî; semen rihan û beydax şîn nebin. Ey mezin û gewreyê min! Bila piştî te çavên xwe ji vê Cîhanê re girt; ey Xuda! Bila tu kes nekaribe nêrgizê bêhn bike. Bila her kesek desteguleкê bigre destê xwe û di dilê xwe de daçikilîne. Bila dengê qebeqeba kewan ji çiyan neyê, bila ne gul reng bide û ne jî gulîzar rengîn be. Ji bo çi Xusrew di nav gulgoyê de bend bûye û Mesture jî ji temaşekirin û dîtina biharê bê aram û bêzar bûye? Ez sond dixwim bi Xudayê yek û teniya di van çend rojên dawiya temenê xwe de; piştî Xusrew Xan temaşkirin û dîtina deşt, çol û gera di nav çîmen û sersew de û gera di nav gul û gulîzaran de; her wisa dîtina gul şemamok û şebûyan, li vê Cîhanê ji min re heram be û ji wan tamê nebînim.

## JÎNAMEYA MESTURE KURDISTAN

Ev helbestkara hêja, wekî stêrkek geş di asîmanê wêjeya Kurdewarî de diteyîse. Navê wê yê rast Mahşrefa keça Ebûl Hesenê Begê Qadirî yane. Ji aliyê gel ve Mahşref Xanim dihat gotin. Mesture Xanim- Mesture Kurdistan nasnavê wê ye. Mesture Xanim li sala 1804'ê li bajarê Sîneyê ji dayîk bûye û pê avêtiye qada jiyanê.
Kurmamê Mesture Xanimê Mîrza Elî Ekberê Sadiqul ku mêjûya Mesture Xanimê di bin navê "Hedîqey Nasiriyê" de, li ser Mesture Xanimê wiha dibêje: " Di binemala me de keçek derketiye; navê wê Mahşrefa keça Ebûl Hesenê Beg e. Nasnavê wê yê helbestvaniyê Mesture Xanim e. Ew di zanist, hûner, xetxweşî, xweşnivîs, rastnivîs, vehûnandin, wêje û helbestkariyê de bêhempa bû. Wê nêzîkî bist hezar helbest vehûnandine. Helbestên wê hestbar, xwezayî, civakî û xweştirîn helbestan bû. Ev keça wêjevan û xwedî giyanek pak û ciwan; piştî çil û sê salên jiyana xwe ya birûmet, çavên xwe, li Cîhanê girtiye û li wê Cîhana din ketiye nava xweşiyê. Ev wêjevana hêja hevsera Xusrew Xanê Waliyê Sîne bû.

Hevserê Mesture Xanimê, Xusrew Xan jî li gel Mesture Xanimê gelek helbest hûnandine û bi hev re xwendine. Hûnerhezî û wêjedostiya Xusrew Xan bûye hoy û sedema vê yekê ku Mesture Xanim di mercên wê rojgarê û serdemê de, di nava wan astengiyên ku li pêşiya çîna jinan hebû, ji bo bişkênîne û bigihe pile û payeyek mezin ya hûnerî û zanyarî, di warê wêje û helbestkariyê de, xebatên bêhmpa dan

meşandin û nav û dengê wê li her cihê Kurdistanê hatiye bihîstin û heskirina gel xwe gihand pileya herî jor.

Mesture Xanim li sala 1847'ê li bajarê Silêmaniyê koça dawî kiriye û gora wê di goristana Girt Seywan de hatiye veşartin.

Gelek berhemên bi nirx nivîsîne û wiha ne:

***1.Dîwana Mesture***
***2.Mêjûya Erdelan***
***3.Namîlkey (Eqayîd û Şer'iyat)***

## ZANISTÊN WÊJEYÎ

Wek me di refên din de dayî diyarkirin; ji pîvana peyvên, ji bo pêkanîna ahengê tê bikaranîn re **pîvan** tê gotin.
Ev helbesta li jor jî bi pîvanan hatiye çêkirin. Ji ber vê çendê helbesta bi pîvan e.
Pîvana Kitê; Pîvana ku xwe dipesêre wekheviya kiteyên rêzikên helbestê.
Hûn jî pîvan her du malikên li jêr diyar bikin.

"Susen û lale, re'ina û gulezerd
Henî sewz neban çenî soz û derd

Spay gulalan, xwar û nigûn ban
Şeqayîq rengzerd cîger pirhûn ban"

**LÊKOLÎN**

1.Mesture Xanim piranî helbestên xwe li ser çi nivîsandine?

2.Mesture Xanim ji bo zoriyên li ser jinan çi kar daye meşandin?

**XEBATÊN AMADEKARIYÊ**

1.Çima di sedsala XIX'an de wêjeya Kurdî pêşdikeve?

2.Serhildanên vê sedsalê lêkolîn bikin û navê çend ji wan serhildanan diyar bikin.

## PÊŞKETINA WÊJEYA KURDÎ DI SEDSALA XIX'AN DE



Di dîroka sedsal XIX'an de, ji ber ku dijminan di nava xwe de şkandin jiyan dikir, aloziyên di navbera dagirkerên Kurdistanê de hişt ku Kurd bikaribin bêhna xwe vedin. Kurdan ji vê yekê sûd girt û di her çar hêlên Kurdistanê de, her çendî herêmî mabin jî serhildan, raperîn û şer li hember serdest û dagirkerên Kurdistanê kirin.

Mînak: Bedirxanî, Ubeydilahê Nehrî, Rewandizî û hwd... Beramberî vê wêjevanî û hozanvaniya welatparêzî jî şiyar

dibe û rola xwe dileyîze. Ji ber ku xwendevan û rewşenbîrên Kurdan yê wê demê zanayên olî ne û gel jî dibin bandora olê Îslamê de ye. Yên serkêşiyê ji vî karî re dikin şêx, mela û feqeyên Kurdan e.
Yek ji hozanvan û wêjevanên Gelê Kurd yên wî demî Hecî Qadirê Koyî'ye. Her çiqas Hecî Qadirê Koyî jî hozanvaniya xwe piranî bi awayê helbest hûnandî anîbe ziman jî bi gotinên xwe yên delal hem kela dilê xwe rijandiye hem amojgarî û rexneyên xwe kirine. Bi vê boneyê Hecî Qadirê Koyî jî yek ji hozanvanên sedsala xıx'an yên ku bi tiliyan tê hêjmartine.

## HETA KU LIHEV NEYÊN QEBÎLÊN KURDAN

Heta li hev neyên qebîlên Kurdan
Her wiha bibin xirabên malan

Hemû dinya mezin û biçûk
Xemilî ye bi milkî wek bûk

Yek berg in, yek ziman û yek reng
Bêxeybet, bê eyb, ar û bê deng

Dinya pitirên dixwin û didin
Her çi meremê wane dikin

Her Kurd in, tenê bi pakî merd in
Bêmalî zeman e, mexsusî Kurde

Her mane bê deng û mezlûm
Mîna erdê xirabe zarê mesûm

Ger basê vê dipirsî kîjane
Şerteke ku bû, hemû temane

Ew şerte bi kullî îtifaqe
Ger Mereş û Wanê, ger Îraqe

Qesreke avakîn ew îtfaqe
Ger wa nebe, her bê taqe

Sed şêx û mela û mîr û xanî
Bo lezeta îş û zindeganî

Li vî alî wan bihîlebazî
Li wî alî wan biteqlebazî

Qir kirin hemû li welat da
Heta milk û riya fewta

Çi te kir, wan ne kird
Xema wan ne bû ku mirin hemû Kurd.

**WATEYA PEYVAN:**
**Milk** :xaka kesekê
**Xeybet** :ne mamî (fesadî)
**Merem** :niyaz- mexsed (niyet)
**Mesûm** :bêguneh
**Kullî** :giştî
**Zindeganî**:xwe jiyan kirin

## JÎNAMEYA HECÎ QADIRÊ KOYÎ (1825-1897)

Hecî Qadirê Koyî li sala 1825'an li gundê Qeregeraç li herêma Koyî ji dayîk bûye. Di biçûkatiya xwe de, bavê xwe windakiriye, dayîka wî ew biriye Koyê û bi alîkariya Axa û Begên dewlemendên xêrxwaz daye xwendin. Ew li mizgefta Koyê, li cem Mela Ehmedê Gumbetî, li gel Mihemed Gelîzade hînî xwendinê bûye, navê feqîtiyê standiye û navê wî bi feqetiyê geryaye.
Çûye Xûşnav, Serdeşt, Hewlêr, Kerkuk, Silêmanî, Sablax û Sinê.
Hecî Qadir li cem mirovên zanyar û zana hîn bûye, bûye mela û binavê melatiyê li Kurdistanê geriyaye. Çûye Stenbolê li wê derê bûye nasê girgirên Kurd û Kurdistanê yên li paytextê Osmaniyan diman. Li Stenbolê Qadirê Koyî bûye nasyarê têkoşerên azadiya Kurdistanê, çend salan bûye mamostayê kurên Bedirxan paşa, li wê derê destana Ehmedê Xanî "Mem û Zînê" dixwîne û pêşgotina wê lê xweş tê. Bîr û baweriya welatparêzî û netewperestiya Ehmedê Xanî dilê wî digre û di hişê wî de dirûne. Ew dibe xemxwarê gelê xwe, helbestên xwe di derbarê rewş û pêşketina gelê xwe de dinivîse. Bi helbestên xwe derdikeve hola rewşenbîrkirina gel, hewldide bi helbestên xwe gel azad bike, ji bin destê şêx, pîr, axa û begên Kurdan û hukumetên Rom û Îranê rizgar bike. Mîna Ehmedê Xanî gel şiyar dike da ku dest bi xwendinê bikin. Di helbestên xwe de wiha dibêje: "Yek bin, li hember hev şer

nekin, ji bo xatirê azadkirina Kurd û Kurdistanê bi hevparî şer bikin.”
Ew di temenê 72 saliya xwe de, li sala 1897’ê diçe ber dilovaniya Yezdan.
Gelek helbestê li ser Kurdan, xwezaya Kurdistanê û bi taybet li ser cihê jê dayîk bûyî û xweşikbûna wê hûnandiye. Dîwanek ya helbestên giranbiha hûnandiye.

## ZANISTÊN WÊJEYÎ

Weke ku me di refên jêr de jî dabû diyar kirin ku pîvana
Arûz: Pîvanek li ser bingehê dirêjî û kurtî, vekirîbûn û
girtîbûna kiteyan çêdibe. Di pîvana arûz de, kiteyên rêzikan
yê beramberî hev, wekhev in. Yanî ger kiteya despêkê ya
rêzika yekem dirêj be, kiteya yekem ya rêzika duwem jî dirêj
e.
Kiteyên vekirî; bi tîpa dengdêr bi dawî dibin.
Kiteyên girtî; bi tîpa dengdar bi dawî dibin.
Kiteyên vekirî û girtî yên malikên jêr diyar bikin.

“Heta li hev neyên qebîlên Kurdan
Her wiha bibin xirabên malan

Hemû dinya mezin û biçûk
Xemilî ye bi milkî wek bûk”

**LÊKOLÎN**

1. Hecî Qadirê Koyî li Stenbolê diçe cem kê û çima?
2. Hecî Qadirê Koyî ji çi bandor dibe ku helbestên welatparêziyê binivîse?

3.Hecî Qadirê Koyî bi helbestên xwe çi amojgariyê li gelê Kurd dike?

**XEBATÊN AMADEKARIYÊ**

Di derbarê Babaniyan de lêkolînê bikin, hindek mîr, hûnermend û pêşevanên wan diyar bikin.

## HELBESTA ŞÊX RIZA TALABANÎ

### LI BÎRA MIN TÊ

Li bîra min tê Silêmanî ku dar ûl milkê Baban bû
Ne mehkumê Ecem bû, ne suxrekêşê Elî Osman bû
Li her tabûrê Esker, rê ne bû, bo meclisa paşa

Seydayê muzîqê û neqerta eywanê keyvan bû
Çaxê meydana cirîdbazî li dora kanî aksan bû
Bi zerba hemla Bexda texsîr kir te hilda

Silêmanî zeman rast tu divê bavkê Silêman bû
Ereb înkarî fesala we nakin efselin emma
Selahedîn ku dinya girt ji zimra Kurdê Baban bû

Qebra pîr ji nûra Elî Baban pir ji rehmet be
Barane kafî ehsana wan mîna ewrê nîşan bû

Çaxê Ebdûla paşa leşkerê waliyê Sinê şer kir
Riza wî wextî emrê wî pênc û şeş tiflê dibistan bû

## Peyv:

**Dar ûl milk** :xaniyê Milk
**Cirîdbazî** :Kesê hespan siwar dibe û dibezîne.
**Hemil** :sefer, qonax
**Zerb** :lêdan
**Fesal** :cûda
**Emma** :lê
**Ehsan** :qencî
**Zimre** :tuxum
**Tifil** :zarok
**Eywan** :salon

## JÎNAMEYA ŞÊX RIZA TALABANÎ

Şêx Riza Talabanî sala 1842'ê li herêma Kerkukê ji dayîkbûye. Bavê wî serokê Şêxên Qadiriyan bû. Şêx Riza Talabanî li cem bavê xwe xwendiye. Hînî zimanê Erebî, Farisî û Tirkî bûye. Li Kerkukê xwendina xwe domandiye û piştre çûye Stenbolê. Piştî du salan vegeriyaye û helbestên xwe bi zimanê Kurdî, Tirkî û Farisî nivîsîne. Sala 1910'ê li Bexda koça dawî kiriye. Dîwana wî du caran li Bexda hatiye çapkirin.

Şêx Riza Talabanî di helbesta xwe de dabaşa serxwebûn û azadiya Kurdan, Kurdên devera Silêmaniyê yên ku serkêşiya

wan Babanî dikin. Ne dibin fermana Osmanî û ne jî Farisan de ne. Fermanrewaya wan ji wane û serbixwen e. Dîsa balê dikişînin ser Selahedînê Eyûbî "ku serkêşî ji Rojhilata Navîn re kirî" bi xwe ji binemala Babaniyane û Kurd e.

## ZANISTÊN WÊJEYÎ

Weke hûn di refên li jêr de hîn bibûn; ji wekheviya dengên li dawiya rêzikên helbestan re **qafiye** tê gotin.

Qafiye herî kêm wekheviya du peyvên deng û nivîsîna wan wekhev lê wateya wan cuda yan jî wekheviya dengên li dawiya rêzikan re qafiye tê gotin.

Qafiye li gor ahengiya deng di navbera xwe de dibe pênc beş.

1.Qafiye Lewaz (Nîv qafiye) :Ji wekheviya dengekê li dawiya rêzikên helbestan re qafiya lewaz tê gotin.

2.Qafiya Tam: Ji wekheviya du dengên li dawiya rêzikên helbestan re qafiya tam tê gotin.

3.Qafiya Dewlemend: Ji wekheviya sê dengan û zêdetir dengan li dawiya rêzikên helbestan re qafiya dewlemend tê gotin.

4.Qafiya hevdeng (cins): Ji wekheviya du peyvên nivîsîn û dengên wan wekhev û wateya wan cuda dikevin li dawiya rêzikên helbestan re qafiya hevdeng (cins) tê gotin.

5.Qafiya Tac: Wekheviya peyvên li dawiya rêzika helbestan ya ku yek di nava ya din de cih digre re qafiya taç tê gotin.

Qafiyeya malika li jêr diyar bikin.

"Li bîra min tê Silêmanî ku dar ûl milkê Baban bû
Ne mehkumê Ecem bû, ne suxrekêşê Elî Osman bû
Li her tabûrê Esker, rê ne bû, bo meclisa paşa"

**LÊKOLÎN**
1.Şêx Riza Talabanî kengê û li kuderê ji dayîk bûye?
2.Hûn jî malikekê saz bikin ku qafiyeya wê diyar bikin.

## HELBESTA WEFAYÎ

Xweşe rojek li alem der bi der bim
Li nav awzayê dinya bê xeber bim
Ji ber taqeta dîwana asa
Ji xoresanê derya bê xeber bim
Şev û roj li çolê her binalim
Herîfî şevrevê bayê sehr bim
Nezan be qet kes navnîşanê min
Eger aqil eger aşîvte ser bim
Li her alî bila bizivire xobara min
Li her cihî wara pêwîste seper bim
Cara bê hilgire cana ji nav dil
Li ronakî dilê yarê xeber bim
Li ber çavê termin soranî birzî
Geh bê dayîk geh bê bavik bim
Xuda! Çawan xwe carê bişewitînim

Ji der û baxê ehwalê xwe der bim
Şevê hey hate rojê binalim
Bi giriyan dest û damanê sehr bim
Qet rêkê çare nabînim Wefayî
Meger serhate çedem xerîqî nezerbim
Ger bê yadê zulf û çavê te lehzekê sebirbim
Hêsîr bendê kafir kuştiyê bê dadê sahir bim

**Peyv:**

Alem: Cîhan
Awza: Herikîn
Taqet: hêz
Sehr: Berbang
Aşîvte:Arşîv
Xobar: Toza hûr
Seper: Sîper
Ronak:Ronahî
Termin: termê min
Ehwal: Koma rewşan
Daman: Rû
Çedem: Kurtkirina “çend demê”
Zulf: Bisk
Lehzek:Bêhnek
Sahir: Fêlbaz

# JÎNAMEYA WEFAYÎ

Dibêjin ku Wefayî serdarê hozanvanê Babilaxê (Mehabad) bû. Ew bilbilê baxçê welatê Mukriyan bû. Navê wî yê rast Hacî Mîrza Rehîm e. Kurê Mela Xefûr e. Li Sala 1844’an de, li bajarê Seblaxê ji dayîk bûye. Her li wê derê xwendiye.
Hînî zimanê Farisî û Kurdiya wêjeyî bûye. Bi zimanan jî helbest nivîsîne û gotine. Şêxê Nehrî pê dihese ku Wefayî helbestvan û dengbêjek xweşgoye.  Wî gazî Wefayî kiriye û aniye li gel xwe. Wefayî demekê dirêj li gel Şêx Ubeydulahê Nehrî maye. Helbestên evîndarî û heskirinê jêre gotine. Li gel Şex Nehrî derbazî Silêmaniyê bûye. Li Silêmaniyê li gel kesên zana fêrî zanînê bûye.
Piştre li gel Şêx Seîd Xefîd, Şêx Mustafa û Tevfîk (Pîremêrd) çûye hecê û li sala 1902’ê de, di rê de, li çola Erebistanê nexweş ketiye û çûye ber dilovaniya Yezdan.
Tevfîk dibêje, min ew bi destê xwe spartiye axê.
Wefayî helbestên xwe piranî li ser evîndarî, xîzanî û belengaziyê nivîsandine. Di çêkirina helbest û xemlandina helbestê de awayê Melayê Cizîrî li ber çavan girtiye.
Dîwana wî ya helbestan piştî wî li sala 1978’an de li Bexda hatiye çap kirin.

## ZANISTÊN WÊJEYÎ

Weke hûn di refê jêr de jî fêr bibûn, ji wekheviya du peyv yan jî pêvekên di heman wate û erkî de dikevin piştî qafiyeya rêzikên helbestan re redîf tê gotin.

Redîf  di nava xwe de dibe sê beş:

1. Redîfa bi peyvê çêdibe.
2. Redîfa bi pêvekê çêdibe
3.Redîfa bi birepeyvan çêdibe

Hûn jî redîfên malika li jêr diyar bikin.

“Xweşe rojek li alem der bi der bim
Li nav awzayê dinya bê xeber bim”

**LÊKOLÎN**

1.Wefayî kengê û li kuderê koça dawî kiriye?
2.Redîfa bi pêvekan çêdibe, lêkolîn bikin.

## HELBESTA ŞÊX MIHEMED KERBELAYÎ

Hûrî peyker dîlberek min dî li camê de eyan
Lew ji min efxan û nalîn her diçin ta kewkeban

Kîsowê çîn çîn musessel wê ji ser ta zêrî pa
Helqe helqe zûlfê derdorê rûxweş çûn eqreban

Çeşmê şehla xemzedar û qewsê ebrû emrî kir
Çehreyê gulgun minewer ser wê qet xwûnceleban

Sumbulan seywan vedane wê li etrafê gulê
Hem li rûxsarê gulê nû jale dane încîyan

## Helbest bi kurmancî:

Dîlberek hûrî beden zelal min dî peyala meyê da
Lewra j imin fîxan û nalîn her diçin heya stêrkan

Keziyên xemgelî ji serî heya piyan rêz bûne
Zûlfê derdorê rû helek helek çû birca dupişkan

Çavên şuhla îşaretkare û kevanê biryan emir kir
Riya rengegul û nûranî wê li ser bejna xwûncelêvan

Sumbulan seywan vedane wê li hawîrê gulê
Hem hinarkên gulê nû xûnav dane mirariyan

## JÎNAMEYA ŞÊX MIHEMED KERBELAYÎ

Navê wî yê tekuz Şêx Mihemedê Kerbelayî yê Axtepî ye. Di sala 1886'zayînî de, li gundê Axtepa Çinara Amedê ji dayîk bûye.

Ew jî weke her zarokekê Kurdê Xanedan bi perwerdeyek tekuz hatiye xwedî kirin û gihandin. Ji ber zîrekî, serwextî û têgeha wî ya ji asayî zêdetir, ji aliyê malbatê ve zêde dihat heskirin. Şêx Mihemed, kurê Şêx Evdirahmanê Axtepî û neviyê Şêx Hesenê Nûranî ye. Weke malbata xwe kesayetek di zanistên olî û civakî de pispor bû. Kesayetekê welatparêz, wêjevan, hozanvan û helbestvan bû.

Zimanê Kurdî zaravayê kurmancî, zimanê wî yê dayîkê bû. Zimanê Osmanî, Farisî û Erebî baş dizaniya. Wêjeya wan jî dizanî. Bi wan hemû zimanan jî helbestên wêjeyî nivîsandine. Giraniya helbestên wî bi zaravayê kurmancî hatine nivîsandin. Di helbestên xwe yên kurmancî de, ji tasawûfê zêdetir, giranî daye wêjeya kurmancî. Helbestên xwe gele zêde bi mecaz, mînandin û îstareyê xemilandine. Di vê mijarê de bûye şopgirê riya Melayê Cizîrî.

Şêx Mihemed Kerbelayî piştî xwendina Quranê, di medreseya malbatê de bi cih bûye.

Weke her xwendevanekê Kurd yê wê demê pirtukên olî bi zimanê Erebî xwendine. Her wiha ji bo bêhtir ji Cîhanê agadar bibe, perwerde li ser zimanê Osmanî û wêjeya Farisî dîtiye.

Şêxê me 14 salan piştî serhildan û bizava şêx Seîdê Kal di sala 1346'ê koçî û 1939'ê zayînî d çû ber dilovaniya Yezdan.
Berhemên wî
1.Ferheng (Kurdî - Farisî) navê wê Mirsad ûl Etfal
2.Dîwana Helbestan

## ZANISTÊN WÊJEYÎ

Weke hûn di refên duyan de fêr bibûn ku ji nîşandana bi tîpan ya qafiya rêzikên helbestekê re sazûman qafiyê tê gotin.

Qafiye li gor sazûmaniya xwe dibe pênç beş:

**1.Qafiya Rast**: Qafiya hemû rêzikên malika helbestê wekhev e.

Lê belê ger di malikê de rêzika dibe nakarat hebe, dibe qafiya wê rêzikê cuda be.

**Wiha tê nîşandan: "aa/bb/cc…", "aaaa/bbbb/cccc/..."; "aaab/cccb/dddb/…"**

**2.Qafiyeya pêçayî**: Di vê qafiyê de wekheviya dengên li dawiya rêzika yekem ya helbestê û ya çarem de heman e û her wiha tê xwestin ku qafiya rêzika duwem û sêyem heman be.

**Wiha tê nîşadan: abba/cddc/effe…**

**3.Qafiya Çeprast:** Di vê qafiyê de wekheviya dengên li dawiya rêzika yekem ya helbestê û ya sêyem de heman e û her wiha tê xwestin ku qafiya rêzika duwem û çarem heman be.

**Wiha tê nîşandan: abab/cdcd/efef…**

**4.Qafiya Puşandî:**Di vê qafiyê de wekheviya dengên li dawiya rêzika yekem ya helbestê û ya sêyem de heman e. Ev qafiye bi awayek giştî di malikên sêtik de çêdibe.

**Wiha tê nîşadan: aba/cdc/efe…**

**5.Qafiya Dûrik:** Di vê qafiyê de wekheviya dengên li dawiya rêzika yekem, duwem û çarem ya helbestê heman e yan jî qafiya rêzika yekem û duwem wekhev e. Di her du rewşa de jî qafiya rêzika sêyem cuda ye.

**Wiha tê nîşandan: aaba/ccdc/eefe…**

**aab/ccd/eef…**

Hûn şemaya helbesta li jêr diyar bikin:

"Hûrî peyker dîlberek min dî li camê de eyan
Lew ji min efxan û nalîn her diçin ta kewkeban
Kîsowê çîn çîn musessel wê ji ser ta zêrî pa
Helqe helqe zûlfê derdorê rûxweş çûn eqreban
Çeşmê şehla xemzedar û qewsê ebrû emrî kir
Çehreyê gulgun minewer ser wê qet xwûnceleban
Sumbulan seywan vedane wê li etrafê gulê
Hem li rûxsarê gulê nû jale dane încîyan"

**LÊKOLÎN**

1.Şêx Mihemed Kerbelayî kengê û li kuderê ji dayîk bûye?

2. Hûn jî malikekê helbestê binivîsin û şemaya wê nîşa bikin.

# TEST 1

1- Kîjan ji yên jer taybetmendiyên bingehîn yên wêjeyêne?
   a- Ziman-uslub estetîk-xweşikbûn
   b- Xweş xwendin – xweş nivîsîn
   c- Li hev hatin- rêk û pêkî
   d- Vîn – heskirin
   e- Têkilî- danûstansdin
2- Kîjan vebijarka li jêr mijarên wêjeyêne?
   a- Dîrok – xaknîgarî
   b- Ceng- penaberî
   c- Xwendin- nivîsandin
   d- Helbest-pexşan
   e- Mijar – axaftin
3- Di kîjan sedsalê de wêjeya Kurdî pêşketinên nû bi xwe re çêkirine?
   a- Sedsala 16
   b- Sedsala 17
   c- Sedsala 18
   d- Sedsala 19
   e- Sedsala 15
4- Pîvana kiteyê çiye?
   a- Pîvana xwe di pesêre wekheviya dawiya rêzikên helbestê
   b- Wekheviya dengdêrên rêzikên helbestê
   c- Xwe di pesêre wekheviya kiteyên rêzikên helbestê
   d- Xwe di pesêre wekheviya malikên helbestê

e- Xwe di pesêre hêjmara peyvên rêzikên helbestê

5- Hecî Qadirê koyî di navbera kîjan salan de jiyaye?
   a- Di navbera 1822-1897
   b- Dinavbera 1825- 1899
   c- Dinavbera 1925-1997
   d- Dinavbera 1920-1998
   e- Dinavbera 1825-1897
6- Helbesta bi navê “li bîra min tê” ya kîjan wêjevanê Kurde
   a- Ehmedê Xanî
   b- Zîwer
   c- Nalî
   d- Şêx Riza Telebanî
   e- Feqiyê Teyran
7- Wefayî kengî û lî kuderê hatiye cîhanê?
   a- 1855 Silêmaniyê
   b- 1844 Seblaxê
   c- 1944 Hewlêrê
   d- 1845 Hemedanê
   e- 1842 Amedê
8- Qafiya rast çawa tê nîşakirin?
   a- aa-bb aaaa-cccc
   b- abab- bbca
   c- aaba- caab
   d- baab- abab
   e- abab- abab

9- Şêx Mihemed Kerbelayî kengî û lî kuderê hatiye cîhanê?
   a- 1886 li Kerbelaya Îraqê
   b- 1886 li Çinara Amedê
   c- 1896 li Zaxoya Dihokê
   d- 1986 li Misêbîna Mêrdînê
   e- 1866 li Amûda Qamîşlo

10- Redîf çiye?
   a- Wekheviya kiteyên rêzikên helbestê ye.
   b- Dûbarekirina peyv yan pêvekên bi heman wateyê li piştî qafiya tên dûbarekirinin.
   c- Wekheviya dawiya rêzikên helbestêne.
   d- Dûberekirina peyv yan jî pêvekên bi wateyên cûda li dawiya rêzikan tên dûbarekirinin.
   e- Pîvana dengên kiteyên helbestêye.

## ROJNAMEYÊN DESPÊKÊ

Rojnameyên despêkê ne bi serûber in. Mirov nikare tiştekî wiha bixwaze jî, dê bêcih û nerast be. Serûberî jî xwediyê dîroka xwe ye. Her destpêk zêde ne bi hişmendî ye, bi vekirinekê ne zêde bi hişmendî ne.
Welat û sala rojnameyên despêkê jî mîna nûçenameyan e. Cihê derketina rojnameya despêkê bi nîqaş e. hin dibêjin Elmanya, hin Holanda û hinek jî Italya ye.
Hin lêkolîner rojnameya *Avisa, Relation oder Zeitung* ku Johann Carolus derhêner û xwediyê wê ye û li Strasbourgê bi Elmanî sala 1609´an hefteyî derçûye, wek ya despêkê dipejirînin.
Nûçeyên vê rojnamê li ser siyaseta derve û şer bûn. Nûçe bêşîrove, bê dahûrandin û bê cudayî bûn. Bi heman navî rojnameyeke din sala 1609´an li Augsburgê û li Kolnê sala 1610´an bi navê "Gedenk Wurdige Zeitung" du rojnameyên din hatine weşandin.
Yekemîn rojnameya Ingilistanê sala 1622´an 14´ê Gulanê bi navê "The Weekly News From Italy and Germany" li Londra, yekemîn rojnameya Firensî sala 1631´ê "Gazette" hefteyî, li Parîsê, sala 1640´î li Roma yekemîn rojnameya Italî "Gazette Publica" û Li Polonya jî yekemîn rojname sala 1661´ê derketine.
Yekemîn rojnameya Kurdî jî ya binavê "Rojnameya Kurdistan" 22'yê Nîsana sala 1898'an li Qahîrê dibin pêşevaniya Miqdad Bedirxan de hatiye weşandin. Ev rojname bûye destpêkirina dîroka çapemeniya Kurdî. Wê cihekî girîng

di dîroka ziman û wêjeya gelê Kurd de girtiye, ji ber ku cara yekemîn bû bi zimanê Kurdî, rojnameyek derbikeve. Piştî ku hat girtin, cihê wê ji Qahîrê hat guhertin, li London û Cinêv weşana xwe berdewam kir. 3000 jimar derêxist û dişand Kurdistanê. Li ser mijarên konevanî û çandî dirawesta; lewra di hejmara xwe ya destpêkê de, Mem û Zîna Ehmedê Xanî weşand û kir sembola rûpelê destpêkê, ji bo ku bi riya wê sembolê bala gelê Kurd bikişîne ser pejirandina endûstiryê. Ji ber ku bi wê rê pêşketina gelê Kurd didît.
Her çiqas ev rojname weke rojnameya yekemîn ya Kurdî tê pejirandin jî lê beriya rojnameya Kurdistan derbikeve li Kurdsitanê, bi taybetî li Amedê, sala 1868´an bi qasî 30 rojname û kovar derketine, belê hemû herêmî û navçeyî ne.
Her wiha li Xarpêtê jî ji sala 1883´an û bi vir ve heta sala 1957´an 13 rojname û kovarên herêmî û navçeyî derketine. Yek ji van Mamuretuleziz sala 1883 û 84´an derketiye.
Sedsala XIX’an çawa bûye sedsala pêşxistina ziman û wêjeya Kurdî, her wisan bûye despêka rojnameygeriya Kurdî jî.

## ZANISTÊN WÊJEYÎ

Helbest, cûre nivîsînek herî girîng ya nivîsînên wêjeyî ye. Bes ne di aliyê awêneyê de, di aliyê naverokê de jî ji wêjeya din cuda ye. Hêvî, xiyal û evîn, hemû bi helbestê tên ziman.

Helbest di nava xwe de dibe heft beş.

***1.Helbestên Lîrîk***
***2.Helbestên Epîk***
***3.Helbestên Dîdaktîk***
***4.Helbestên Pastoral***
***5.Helbestên Satîrîk***
***6.Helbestên Dramatîk***
***7.Helbestên Sembolîk***

### HELBESTA PÎREMÊR

Hewa havînê hewa havînê
Îsal havîna me zor bi kîne

Girê agirê sebûn sî tîne
Bergê esman bo me şîne
Feslê gulgeştê baxê penawîne
Ev sebûna me ji kuve hat?
Bi tîna germê hilqirça welat
Stêra te li xwe guharî nehat
Bişne şîveya şemal, kiş û mat
Dil vê germê qîz xemgîne

Girê yarê cîyê rojtavê
Rêya seyranê Newroz biriye

Karêza şerîf av têde maye
Erxewan çixpopê wê şkaye

Girê seyran ciyê zar û şîne
De Xudê hilkeve qizina şemalê

Hewa zenga xemê min ji dil bimalê
Ay! Bû dengxweşek di gel şimşalê

Bi wê xwestinê têr bûm binalê
Derdê min kariye û cerga min birîne

## JÎNAMEYA PÎREMÊR

Navê rast yê pîremêrd Tewfîq e. Tewfîq kurê Mehmûd axayê Hemze axa ye. Pîremêrd nasnavê wî ye. Ev wêjevan li sala 1867'an de li bajarê Silêmaniyê ji dayîk bûye.

Pîremêrd, zarokatiya xwe li Silêmaniyê derbaz kiriye. Çanda xwe ya zarokatî ji malbata xwe û ji zarokên Silêmaniyê girtiye. Di heft saliya xwe de dest bi xwendina Quranê kiriye. Piştî xwendina Quranê li Hucreyan pirtukên Erebî û Farisî dixwîne. Her du zimanan jî hîn dibe. Ji bo hêj baştir van her du zimanan fêr bibe, diçe cem Mele Mehmûdê pêşrewî; li mizgefta Hemze Axa demekê dirêj dixwîne. Hem xwendina Hucreyan diqedîne hem baş fêrî zimanê Erebî dibe.

Di navbera salên 1882 û 1898'an de karmendiya hukmetê dike.

Di erkên cûr be cûr de xebatê dike. Di sala 1909'an de dibe qeymaqamê Colemêrgê.

Li sala 1918'an dibe Muteserifê Amasayê. Piştre hevser û du kurê xwe li wir dihêle û dizivire Silêmaniyê. Piştî tê Silêmaniyê Hisên Nezmî serkêşiya Rojnameya Jîn dide wî. Di sala 1934'an de Hisên Nezmî diçe berdilovaniya Yezdan û Pîremêrd dibe rêveberê Rojnameya Jîn.

Pîremerd digot, mafê ji mêr û xortan re tê naskirin, divê ji jin û keçan re jî bênaskirin. Ji bo em ber bi Cîhanek pêşketî ve biherikîn.

Pîremêrd di pêvajoya jiyana xwe de ji bo gel gelek xebat kiriye û di sala 1950'an de li bajarê Silêmaniyê çûye berdilovaniya Yezdan.

## ZANSITÊN WÊJEYÎ

**1.Helbestên Lîrîk**: Ji wan helbestên hestyar, yên ku bi zimanekî coş û xemgînî tên vegotin re helbestên lîrîk tên gotin.

Helbesta lîrîk ji ramanê bêhtir deng li hestan dike û balê dikişîne li ser hestan.

Helbestên ku hemû beşê civakê têkîldar dike; hestên hevpar yên weke heskirin, coş, xemgînî, evîndarî, ji hev qutbûn û bêrîkirinê bi awayek bi xurûş tîne ziman re helbestên lîrîk tên gotin.

Helbestvanên me yên gelêrî piraniya wan bi vî awayî helbestên xwe gotine.

Her çiqas li gor rojava peyva lîrîk Yuananî jî hatibe bikaranîn lê çavkaniya wê ya bingehîn Kurdî ye û Yunanan jî ji Kurdî biriye û di awayê helbestên xwe de bi wate kirin.

Helbestên Lîrîk ji peyvên lîliya Kurdî û lorîka Kurdî hatiye herikandin.

**LÊKOLÎN**

1.Pîremêrd kengê û li kuderê ji dayîk nebûye?

2.Hûn jî helbestekê lirîk peyda bikin.

## HELBESTA CÎHAN ARA XANIM

Qiblem demax im qiblem demax im
Nemenden niyen berzî demax im
Dûr ce tu perdeyî derûn dax im
Zincir teqdîr kerden yasax im
Kem kem kerden kem somay çirax im
Pejmurd en qunçey gulaley bax im
Per kenden kilaf xeyatey dêzim
Nîmûnen nergîz şehlay hûnirêzim
Zerden gul wereq gonay gulnarim
Kesas en tuhfey mayey bazar im
Talen tam dem tala û werdekem
Kol en ah serd siyay derdekem
Lêl en ayîney cam cemînim
Qelah en kalay balay xemînim
Narewa cen lal durc yemanim
Bê qurb en gewher nuqil nîhanim
Bê seyr en sefay qew qeşeng im
Toz xêl xem weşt en ne rengim
Temam her ce tîre taney bedkaran
Mer heq biza no çonim û yaran
Azîzim ye gişt meynet barî ton
Êyş û nêş xem weza mîdarî ton

Cefay bedkaran gişt ce boney ton
Taney Exyaran gî ser koney ton
Xesre û şîrîn wêl ce song ton
Mecnûn Leylê risway long ton
Senem ta Mehser tersa yar ton
Yusiv Zelîxa girifşar ton

## DAXUYANÎ

Wate: Ey heskiriyê min! Êdî ew berzahî û keyfxweşiya min, Ya carnan nemaye û perdeya derûniya min, hûndirê min sinciriye. Sor bûye, ez disoj im, zincîra çarenûs û qederê li pêşiya min girtiye. Ronahiya çiraya min vemiriye û gulên baxê min çirmisîne. Ez ew qas giriyame ku ji çavên min xwîn dibare. Rûyê min zer bûye. Diyare ku bazara min kesade û bê sûd e. Tama devê min tehl bûye. Hinavên min sar in. Ez bi derd im. Awêneya di nav çavên min de tarî bûye. Cewherê di nava min de bê behr û bêkêr bûye. Hin toz û xemam ketiye ser rûyê min. Ji ber ku bê hîsab ewqas tan li min dane.Tenê Xuda bi xwe dizane ku min çawa jiyana xwe derbaz kiriye. Ey heskiriyê min! Ev hemû xem û nexweşî ji bo xatirê tene ku tên serê min û ji ber te ez tanên xelkê dipejirînim. Xusrew

û Şîrîn, Mecnûn û Leyla, Senan, Yusiv û Zelîxa hemû girêftar û dîlê tene.

Cîhan ara dirêjiyê dide gîlî, daxwazên xwe û pêde diçe. Ji ber ku berê ji hevserê (mêr) xwe heskiriye, nikare dev jê berde û destan jê bikişîne. Bi ber dilê wî ve diçe.

## JÎNAMEYA CÎHAN ARA XANIM

Cîhan Ara Xanim keça Mela Neşetê Paweyî ye. Di sala 1859'an de li Paweyê ji dayîk bûye. Di zarokatiya xwe de, li gel bavê xwe xerîkî xwendinê bûye.

Piştre bavê wê mamostayê taybet jêre girtiye. Ew li gel mamostayê xwe fêrî ziman û wêjeya Erebî bûye.

Cîhan Ara Xanim yek ji mezintîrîn û xuyayî helbestvana Kurd tê dîtin. Helbestên wê gelek şîrîn û baldar in. Lê mixabin hemû nehatine berhevkirin. Li gorî tê gotin, Cîhan Ara Xanim di aliyê xweşikbûnê de jî bêhempa bû. Vê hûnermenda ciwan piraniya temenê xwe yê piştî qedandina xwendinê bi perwerde kirina zarokê xwe û yê civakê ve derbaz kiriye. Ev wêjevana hêja bi tinaskirinan bala civakê dikişîne li ser xwe.

Di sala 1911'an de, dema ku temenê wê bûyî 52 sal li Ciwan Rûyê koça dawî dike. Wê li wê derê vedişêrin.

## ZANISTÊN WÊJEYÎ

2.Helbestên Epîk: Ji wan helbestên ku mijaran wan şer, egîdî, lehengî û welatparêziye re helbesta Epîk e.

Bûyerên dîrokî bi vegotinek kelecan vegotin dike.

Ev cûre helbest dirêj in. Ji ber wê ji van helbestan re helbestên destanî, helbestên lehengî jî tê gotin.

Helbestên epîk yan jî weke destanên hûnandî xwe dipesêrin serpêhatiyek dirêj.

Helbestên epîk pêvajoya jiyana rojane ye.

Di helbesta Epîk de girîngî ji vekirina bûyeran re tê dayîn. Li gel vê bes leheng sereke tenê mezin nabin. Li dora wî hevalên wî û dijberî wî hene.

Hozanvanên helbestên Epîk her tim efsaneyê weke çiqek yê dîrokê digrin dest.

Dem, cih û dûr û nêzîkatî nîşanên eşkere yên epîkê ne.

Destana Gilgamêş jî weke helbesta Epîk tê pejirandin.

Di helbesta li jor de ji ber ku hûnermend li ser evîndariya xwe bi awayekî dil bi kul nivîsandiye, helbesta lîrîk e.

**LÊKOLÎN**

**1**. Helbestek Epîk peyda bikin û di refê de bixwînin.

**2**.Li gorî we cudahiya di navbera helbesta lîrîk û Helbesta Epîk de çiye?

**3**.Cîhan Ara Xanim kengê û li kuderê ji dayîk bûye?

## HELBESTA NÛRÎ DÊRSIMÎ

Pîrê min Mela Xidir e
Mela xwe jî xîtek dor e
Xiyalan meke dil û jêre
Dilê pak de tim pîr hazir e

Ez qurbana pîrê xwe me
Ez heyrana pîrê xwe me
Ez xulamê şimika te me
Ez mirîdê dergehê te me

## JÎNAMEYA NÛRÎ DÊRSIMÎ

Bijîşk Nûrî Dêrsimî, navê wî yê tam weterîner Dr. Mihemed Nûrî Dêrsimî ye. Di nava gel de zêde Nûrî Dêrsîmî tê bikaranîn. Ev hozanvan di sala 1892'an de, di ax Zunîka gundê Xozatê de ji dayîk bûye. Navê bavê wî Mela Birahîmê kurê Mela Mihemed Elî ye.

Malbata wî berê ji gundê Bornaka Ovacika Dêrsimê koçberî vî gundî bûye. Bi xwe ji eşîra Milaye. Dibêjin Eşîra Milan tev ji vî gundî belav bûne. Wêjevanê me yê hêja piraniya xwendina xwe li cem mamê xwe Mela Hesen

xwendiye. Lê hûnerê hûnermendiya helbestê ji bavê xwe Mela Birahîm fêr bûye. Heya niha jî helbestên bavê wî di dîwanxanan de tên gotin. Navê dayîka wî Zelxe (Zelîxa) bû.

Li sala 1899'an de diçe dibistana Seretayî. Dibistana seretayî û navîn bi serkeftinek mezin diqedîne. Li gel wê fêrî zimanê biyanî (Osmanî) jî dibe. Piştî qedandina dibistana Navîn derbazî dibistana Amadeyî ya Xarpotê dibe û li wir dixwîne. Li sala 1911 Nûrî Dêrsimî li Stembol diçe zanîngehê. Nûrî Dêrsimî li sala 1912'ê dikeve nav Kurd Talab-Cemiyeta Hêvî, li wê derê di demekê kurt de xwe bi hevalên xwe dide pejirandin û xebatên hêja dimeşîne. Li ser vê xebatên wî yên giranbihahevalên wî jêre pêşniyara endamtiya navendî dikin. Ev komel di wê demê de kovara Rojî Kurd dertêxin. Nivîsînên wî di kovara Rojî Kurd, Yekbûn û Hetawî Kurd de dihatin weşandin. Di sala 1914'ê de tevlî şerê Cîhanê dibe û li herêma Erzîncanê karê ramyarî dimeşîne. Li sala 1920'ê desturnameya xwe werdigre. Di serhildana Koçgiriyê de cih digre û piştî têkçûna serhildana Koçgiriyê weke kesek siyasetmedar diçe Dêrsimê, li gel Seyd Riza karê rêveberiya serhildana Dêrsimê dimeşîne. Piştî têkçûna serhildana Dêrsimê û darvekirina Seyd Riza û kurên wî derbazbî rojavayê Kurdistanê dibe.

Nûrî Dêrsimî li sala 1973'an de, di temenê 81 saliya xwe de li Helebê koça dawî dike. Termê wî radikin Efrînê û li Efrînê tê veşartin.

## ZANISTÊN WÊJEYÎ

3.Helbestên Dîdaktîk

Ji wan helbestên ku mijara wan amojgarî û waneyekê dide xwendevanê xwe, bi armanca fêrkirin û perwerdeya hoyî û di wan de aliyê hestan kêm re helbestên dîdaktîk tê gotin.

Bi kurtî helbestên fêrker in.

Helbesta li jor helbestek lîrîk e. Ji ber di vê helbestê de aliyê hestan li pêş e.

**Mînaka Helbesta Dîdaktîk:**

“Munebbeh ey arifê bul kemal
Bibêjim ji bo te beyanek delal

Çi qas enbiya û resûlê Xuda
Hemû pêşîvan e hemû mûqteda”

**LÊKOLÎN**

1.Cudahiya di navbera helbesta Epîk û helbesta Dîdaktîk de çiye?

2. Hûn jî helbestekê Dîdaktîk binivîsin.

3.Nûrî Dêrsimî kengê û li kuderê ji dayîk bûye?

## HELBESTA CELADET BEDIRXAN

### ALA KURDAN

Ala Kurdan di nav rok
Çi bedew û bi heybet
Bi çar rengî rengê te
Çi delal û çi xweşkok

Xêzek kesk û xêzek sor
Nav spî û nîvek zer
Kekse sore bi roje
Ev li jêr û ew li jor

Semyana keç û lawan
Rûmeta jin û mêran
Neyarên te pir jî bin
Tu dê bidî bera wan

Ku çirisî roja te
Dê belav bin mij û dû
Rabe ser xwe serbilind
Nêzîk bûye roja te

## JÎNAMEYA CELADET BEDIRXAN

Celadet Bedirxan kurê Emîn Elî Bedirxan e. Navê Bedirxan Paşa ye. Celadet Bedirxan li sala 1893’an de li bajarê Stembolê ji dayîk bûye.
Ji ber ku Emîn Elî Bedirxan dadger bû, di gelek bajarên rojava de dadgerî dikir. Ji ber vê çendê Celadet Bedirxan jî xwendina xwe ya pêşî û navendî, di gelek dibistanan de û li cem gelek mamosta xwendiye. Lê bavê wî ji ber qedexebûna çûyîna Kurdistanê ji bo peywendiya zarokên wî, ji çand, ziman û wêjeya netewî neqete; ji welat mamosta, hozanvan, dengbêj, çîrok û sazbend û her weke din di anî. Bi taybetî zarok digihandin. Celadet Bedirxan bi rewşê weke ku di Kurdistanê de be, bi çanda netewî hatiye mezin kirin û dema mezin bû, li ser vî bingehî xwe hêj tekuztir kiriye.
Di sala 1922’ê de dewletê fermana darvekirina gelek Kurdên welatparêz derxist. Di nav wan de Emîn Elî Bedirxan û her sê kurê xwe jî hebûn. Emîn Elî li gel kurê xwe Sureya çûn Misirê. Celadet li gel birayê xwe Kamuran derbazî Elmaniyayê bû. Celadet Bedirxan ji derveyî welat jî xebata li ser Elfebayê jî ji bîr nekir.
Piştî nivîsandina Elfebaya Kurdî derbazî Misirê dibe. Ji wê derê derbazî Surî dibe. Dema derbazî Surî bûyî Serhildan Şêx Seîd têkçûyî bû û gelek Kurd derbazî Sûrî bibûn. Wî bi gelek ji wan re jî hevdîtin pêkanî bû. Celadet Bedirxan damezrênerê gelek sazî û komel bû. Nivîskarê gelek nivîsîn û kovaraye. Xwedî û berpirsyarê kovara Hawar û Ronahî ye jî. Celadet di

wan kovaran de bi navê cûr be cûr nivîsînên çandî, wêjeyî, ramyarî, civakî û zanistî nivîsandine.
Celadet Bedirxan di 58'ya xwe, roja 15.07. 1951'an de li gundê Hêcanê koça dawî kir û li goristana bajarê Şamê hate veşartin.
Berhemên Celadet:

***1.Elfaba Kurdî***
***2.Rêzimana Kurdî***
***3.Ferhenga Kurdî***
***4.Rêzimana Elfaba Kurdî***
***5.Dîbaca Mewlûda Pexember ya Mele Ehmedê Xasî***
***6. Name Ji bo Mustafa Kemal***
***7.Dîbaca Nîvejên Êzidîyan***
***8.Edirne Sukutunun iç yuzu***
***9.Ji Mesela Kurdistanê***
***10. Doza Kurdî***
***11.Hawar***
***12. Ronahî***

## 4.Helbestên Pastoral

Ji helbestên Xwezayê, jiyana şivanan ya di xwezayê de tîne ziman re helbetsên Pastoral tê gotin.
Dema jiyana şivan, gavan, gundiyan, çanda çiya, toreya zozanan û xweşikbûnên xwezayî bibin mijarê helbestê, helbest dibe pastoral.
Ev cûrê helbestê di nava civaka Kurdan de weke lawik û serêlî tên binav kirin.
Di van helbestan de heskirina xwezayê û xwezîkatî heye.
Helbesta me li jor xwendî, ji ber dabaşa welatparêziyê dike Epîk e.

**Mînaka Helbesta Pastoral:**

“Ji çira paşî û pêde
Melayê Bateyî kanê
Sefer kêşa di Miksê de
Li ser wextê zivistanê

Zivistanê evê yolê
Evê beriyê,evê çolê
Mijê avête derdorê
Xunavê girtî kêstanê”

**LÊKOLÎN**

**1**. Cudahyiya di navbera helbesta pastoral û helbesta dîdaktîk de çiye?

**2**. Celadet Bedirxan kengê û li kuderê koça dawî kiriye?

**3**. Hûn jî helbestek pastoral binivîsin.

**XEBATÊN AMADEKARIYÊ**

Di sedsala 20’an de rewşa tekoşîna gelê Kurd di çi astê de bû û çi bandora xwe li ser wêje û zimanê Kurdî kiriye? Lêkolîn bikin.

Tekoşîn û serhildanên di vê çerxê de hatîn kirin diyar biki.

## WÊJEYA KURDÎ DI SEDSALÊN XX’AN DE

Di sed sala 20’an de guhertinên mezin yên civakî çêbûn. Di vê sed salê de şoreşa Sosyalîzmê û şoreşên rizgariya netewî derketin pêş. Di gelek cihan de encam jî girtin. Tekoşînek bi hêz li hember hêzên serdestan hat pêşxistin û zemîn ji bo hemû hêlên jiyana wan ya civakî, zanistî, wêjeyî, dîrokî, çandî û nivîsînê hat afirandin. Di gel vê êrişên herî dijwar bi taybet yê Komara Tirk li ser ziman, çand û wêjeya Kurdî di vê sedsalê de hatin pêkanîn.

Êdî ne bi awayekî rewanî belkî bi awayek fizîkî û rewanî êrişî li ser wêje û hebûna Kurdan kirin û xwestin bi awayekî fizikî yan jî rewanî Kurdan ji dîrokê rakin. Her çiqas di encama van êrişan de bi hezaran rewşenbîrên Kurd hatibin darvekirin jî lê di vê kiryara xwe de dagirker bi serneketin û gelê Kurd ev sedsal zivirandin sedsala serhildan û berxwedanên netewî.

Wêjeya Kurdiya ku bihezaran salan derbazbûyî û pêşketî gelek helbest û helbestvanên mezin derxistine.

Nivîsandina Kurdî heya sed sala 19'an kêm hatiye nivîsandin. Sala 1898'an bi derketina rojnameya Kurdistan re zimanê Kurdî pêngavek mezin berbi nivîsandinê ve avêtiye.
Ji bo afirandina elfeba Kurdî gelek hewildan ji aliyê gelek kesan ve hatine kirin.
Ji aliyê Kurdan bi xwe ve zarê Kurdî bi tîpên Erebî hatiye nivîsîn heya salên 1933'yan. Bi vê nivîsandinê, rojname, kovar û dîwanên Kurdî hatine çap kirin. Di sed sala 20'an de nivîsandin û wêjeya Kurdî her çiqas ne li gorî tê xwestin jî bi pêşkeftinek bi xwe re afirandiye.
Bi hilweşandin û belavbûna împeretoriya Osmaniyan re hewildanên rewşenbîrên Kurd yên ji bo pêşxistin û parastina ziman û wêjeya Kurdî ji aliyê netewperestên Tirk ve dihat asteng kirin. Weke me li jor jî dayî diyarkirin, di encamê van çewisandinan de bi hezaran şehîd çêbûn û gelek rewşenbîr neçarî koçberiya dirêj bûn.
Gelê Kurd ji hemû mafên xwe yên ramyarî û netewî hat bê par kirin. Bi avabûna komara Tirkiyê re dewletê tevayî mafê gelê Kurd mandêl kir û hebûna gelê Kurd nepejirand. Gava yekemîna komarê avêtî piştî sererast kirina desthelatdariya xwe ya leşkerî û çewisandina serhildanên Kurdan qedexe li ser çand û zimanê gelê Kurd danî. Komara Tirk, nivîsandin, axaftin, folklor, dîlan, navên Kurdî û hemû peywendiyên gelê Kurd bişaftin û qedexe li ser dan pejirand.
Bi avabûna dewleta Îraqê re ji ber ku qedexeyek weke komara Tirkî nedayî pejirandin, vê yekê hêla ku di Başûrê

Kurdistanê de zanîngehên Kurdî vebin û kêm jî bi nirxandina wêjeya Kurdî li ser wê perwerde û bi taybet li beşê Soran bê domandin. Vê xalê hêlaye ku gelek nivîskar û hûnermendên Kurd ji wê deverê rabin.
Li Îranê jî her çiqas zimanê Farisî yê fermî jî be, zarê Kurdî û wêjeya Kurdî xwe parastiye. Vê parastina wêjeya Kurdî heya rûxandina komara Mihabadê berdewam kir. Piştî rûxandina Mihabadê weşandina radyo ya zimanê Kurdî herêmî ma û peywendiya di navbera herêmên Kurdistanê de lewaz ma.
Di parçê Rojava de ji ber ku dibin desthilatdariya Firansa de bû qedexeyek fermî li ser ziman û çanda gelê Kurd tune bû. Başûrê Biçûk û Şam bibûn navenda kombûna rewşenbîrên Kurdên ji ber zordariya dewletên dagirker revîn.
Lê bi awayek fermî perwerde bi zimanê Kurdî nehatiye dayîn. Ji aliyê rewşenbîr, helbestvan û nivîskarên Kurd ve rojname, kovar, dîwan û gelek berhemên wêjeyî hatine weşandin.

## HELBESTA CEGERXWÎN

Ji bûna her kesê yarek heye ê min welat yare
Belê çi bikim di destê dijminê xwînxwar û xedare

Çi qas pesnê giran bêjim nikarim ez bidim zanîn
Çeleng û nazik û şeng û şepal û şox û cebare

Eve soza min û dîlber eger bimrim di vê rê de
Ji dinyaya xweş û şîrîn Cegerxwîn jê ne bêpare

## JÎNAMEYA CEGERXWÎN (1903-1984)



Cegerxwîn di sala 1903'ê de, li Hesara girêdayî Kercewsa ji dayîk bûye. Navê wî yê rast Şêxmîs e. Navê bavê wî Hesenê kurê Mihemed e. Navê dayîka wî Eyşê ye.

Di zarokatiya xwe de berxvanî, şivanî û gavanî kiriye. Hêj di biçûkaniya wî de bavê wî çûye ber dilovaniya Yezdan. Sêwî maye û li cem xwişka xwe Asya nîştecih bûye. Piştre çavê xwe daye xwendinê û ketiye rêza feqan. Li cem Mela Ubeyd hînî zanista olî bûye. Destûrnama xwe ya olî ya zanistî standiye. Li gelek cihên Kurdistanê geryaye, êş û belengaziya Kurdan bi çavê xwe dîtiye û bûye mereqdar û dilêşê gelê xwe. Piştî vê rewşa gelê xwe dibîne bi awayê hûnandî û pexşan diqîre û dinivîse. Heya niha pênc dîwanên wî çap bûne.

Cigerxwîn sala 1984'ê li Stolkoma Siwêdê çûye ber dilovaniya Yezdan. Gora wî li Qamişloyê ye.

Berhemên Cegerxwîn:

1. Pênç dîwanên helbestan nivîsandine.
2.Jinameya xwe bi pexşanî
3. Dîroka Kurd û Kurdistan
4.Rêzimana Kurdî

## ZANISTÊN WÊJEYÎ

**5. Helbestên Satîrîk:**

Ji helbestên aliyê wan yên rexneker li pêş re helbestên Satirik tê gotin. Kes yan bûyeran bi gotinên tirane û tinazwarî tînin ziman û rexne dike.

Di van helbestan de taybetmendiyên dîdaktîk jî hene. Helbesta me li jor xwendî, ji ber dabaşa welatparêziyê dike Epîk e.

Mînak helbesta Satirikê:

“Haylo delal haylo delal delal
Heylo delal heylo delal
Nesredîno ezê hatime şewitiya şelmo li hembere
Tuyê şevekê were têkeve hewşa mala bavê min
Kulfekê berx û miya bibe û here
Tuyê têkî çarşiya welatê Diyarbekir
Qeza Batmanê bifiroşe temam têke sere
Tuyê ji xwe re bide bi tifingê, bi demancê bi qetek xincere
Tuyê şevekê werî kêrekê li ser dilê kebraxê bavê min bixwe
Ewê herin gilî bikin
Muxtar û ezayê gundê me temam bine sere”

**LÊKOLÎN**

1.Cudahiya di nabera Satirikê û Pastoralê de çiye?
2.Hûn jî helbestek Satirik binivîsin.
3.Cegerxwîn kengê û li kuderê ji dayîk bûye?

## HELBESTA OSMAN SEBRÎ

### DÎCLE Û FIRAT

Ji dil û kezeb evîndarê Dîcle û Firat im,
Nizam bû çiqas bê dilê xwe dûrî we dijîm,
Ev çem ji Bakur dadikeve wek dû welat,
Yek ta Bîrecîk yê din diçe nav diyarê Zîn,
Melê Cizîrî îlhama xwe ji wî çemî distand,
Gelek mirarî di peravên Dîclê de civand,
Ehmedê Xanî jî serekî ava wî vexwar,
Feqê Teyran, Melê Batê pir şarîrên çak,
Hespên xwe bezandin di şaxa çemê çalak,
Ger Dîcle bixwe kaniya zanîn û evîn bû,
Firat pêgera gelek şêrên pence bi xwîn bû.
Di qada rûmet û mêranî her bêhempa bû,
Herdem ji bo her pesnekê hêja û saz bû,
Min hêvî heye Dîcle – Firat barê we rakin,
Dîwarê ziman li Rojhilat xelkê me şakin,
Zimanê meyê paşde mayî çîçkî bide pêş

## JÎNAMEYA OSMAN SEBRÎ

Osman Sebrî sala 1905’ê li nahiyeya Narincê girêdayî Kolika (Kehta) Semsûrê ji dayîk bûye. Ji eşîra Mirdêrsanê ye. Piştî sala 1915’ê bavê wî diçe ser dilovaniya Yezdan, diçe cem apê xwe Şukrî. Osman Sebrî xwendina xwe 1922’an ya “Ruştiya”dawî aniye.
Osman Sebrî di sala 1925’an de serhildana Şêx Seîd derket holê û malbata wî gelek bandor bû. Her du mamên wî Şukrî û Nûrî di belgeya serhildanê de hatin darezandin û ji aliyê dadgeha Amedê ve hatin darvekirin. Osman Sebrî jî bi gunehekê mezin hat gunehbar kirin û şandin zindan Denizliyê.
Osman Sebrî wek kesên din yên Kurd ji ber ku tekoşîna xwe bi awayê ramanî tîne ziman, gelek caran rastî êrîşên dewletê tê û bi tevayî 12 salan hatiye girtin.
Osman Sebrî li sala 1929’ê derbazî binxetê dibe.
Osman Sebrî piştî van êş, jan û bişaftinên dewletê dibîne, dikeve nava hewildanên li ser raman û kedera dilê gelê Kurd binivîse. Gelek berhemên biha dafirîne, rêziman, çîrok, gotarên dîrokî, helbest, dîwan, serpêhatî û wkd... nivîsandiye. Ji ber vê tiştê pitir wî jêhatin û şarezartiya xwe ya di qadên nivîsandina helbestan de nîşakiriye.
Osman Sebrî li sala 1993’an li Şamê çûye ber dilovaniya Yezdan. Ew li gundê Berkevira Tirbespî yê, li binxetê veşartiye.

*Berhemên wî:*
1. Dîwana Helbestan binavê Apo
2. Dîwana Helbestan Bahoz û çend nivîsên din
3. Pirtûka lêkolînê li ser ziman û rêzimana Kurdî
4. Elfaba Kurdî ya ji aliyê Celadet Bedirxan ve hatî sazkirin
5. Çar leheng, şanoyî

## ZANISTÊN WÊJEYÎ

**6. Helbestên Dramatîk:**

Cûre helbestek di şanoyê de tê bikaranîne. Hem bûyerên êşber hem jî bûyerek tirsnak dibe mijara wê.
Helbesta me li jor xwendî, ji ber dabaşa welatparêziyê dike Epîk e.
Her wiha aliyên helbesta pastoral jî têde hene ji ber taybetmendiyên xwezayî tîne ziman.
Mînaka Helbesta Dramatîk:
“Bi erd û esman bi navê Xudê
Nizam bi çi riyê bibêjim yadê
Min tu hêlayî dil kul xemxwar
Ji lewra îro şermendem rûsar
Tînim bîra xwe salên ku borî
Ji bo kama min çerbûyî borî
Goriyek bêdeng bê gilî gazind
Te pir êş dîtin bû armanca min…”

**LÊKOLÎN**

1.Çend berhemê Osman Sebrî binivîsin.
2.Hûn jî helbestek dramatîk binivîsin.
3.Osman Sebrî kengê û li kuderê ji dayîk bûye?

## HELBESTA GORAN

### ÇÎROKA BIRATIYÊ

Em dixwazin bira bin
Meywê şîrîn biçînîn ji darê
Em dixwazin azadiya xwe
Gul bigihin li baxçê biharê
Ev sale baştir bê ji sala par
Em bi hev re bin îtbar
Êdî destê zordar û îstîmar
Neyê, negije ser me
Em ber bi asoya ronakbin
Rêya rast bigrin pak niyazbin
Mîna gelên din pak birabin
Li gera kotirê bask spîbin
Ber bi asoyê şîn alîbin
Siwarê yekîtiya yek xeberbin
Pey bikevin ber bi wê ve herin

## GORAN(1904-1962)

Navê wî Ebdullahê kurê Silêman e. Li sala 1904'ê li bajarê Helebçe ji dayîk bûye. Goran di biçûkatiya xwe de fêrî zimanê Farisî û Tirkî bûye. Goran nasnavê wî ye. Goran, navê xwe ji eşîra dijminê xwe girtiye.
Di xortaniya xwe de jî Goran li dijî mergê eşîrtî û pev çûnên eşîrtî bû. Goran di nava mercên jiyana zor û zehmet de jiyan bûye. Di xortaniya xwe de sêwî maye. Xwendina xwe ya navendî li Kerkukê temam kiriye. Piştî birayê wî yê mezin hat kuştin, sala 1922'ê xwendina xwe berda, bû xudanê malê.
Di navbera salên 1925-1937'an de mamostatî li gundê derdorê Silêmaniyê dikir. Di pêvajoya şerê cîhanê yê dûwem de partiya Hîwa ew rêkir Filistînê. Ji bo bibe rêvebirê Radyoya Kurdî. Goran ji sala 1945 heya 1947'an di karê radyoyê de dixebitî. Ji bo şiyarkirin û zana kirina gelê Kurd, taku xwe binase, rabe ser xwe û mafê xwe yê netewî bi dest bêxe bangewazî kir. Ji ber ku helbestek li ser tekoşîna gelê Kurd çêkirîbû, li sala 1950'an Îngîlîzan Goran girtin û avêtin zêndanê. Piştî Pîremêrd rojnama Jîn jî birêvebir.
Sala 1954 û 1956 du caran hat girtin. Heya şoreşa Tîrmeha sala 1958'an di zîndanê de ma, piştî derket kovara "Şefaq" weşand. Piştê wê çû Bexda, li zankoya wêjeya Kurdî mamostatî kir û rojnama "Azadî" weşand.
Ji ber sedema nexweşiya Penceşêrê çû Rosyayê lê tû sûd ji dermakirina wê derê nedît. Li sala 1962'ê çû ser dilovaniya Yezdan.

***Berhemên Goran***
Dîwana helbestan nivîsandiye.

## ZANISTÊN WÊJEYÎ

Helbesta bi navê "Çîroka Biratiyê" helbestek dîdaktîk e. Ji ber ku Wêjevanê hêja Goran xwestiye bi riya vê helbestê hin amojgarî û şîret li Kurdan bike.
Hemû helbestên bi armanca amojgarî û şîretan têne nivîsandin re helbestên Dîdaktîk tên gotin.

**LÊKOLÎN**
1.Berhemên Goran lêkolîn bikin û navê çendekan binivîsin
2.Sedemê çûna wî ya Filistînê çibû?

## HINEK KOVAR Û ROJNAMEYÊN KURDÎ

**1-Rojnama Kurdî**: Di sala 1907'an de ji aliyê Şêx Ebdilqadirê kurê Evdilayê Şemizînî ve, li Stenbolê bi zimanê Kurdî û Tirkî dihat weşand.

**2- Kovara Roja Kurd**: Di sala 1913'an de li Stenbolê bi zimanê Kurdî û Tirkî dihat weşandin. Li ser rûpelê wê yê despêkê wêneyê Salahedînê Eyûbî hebû. 32 rûpel bûn. Piştî navê wê hat guhart. Navê wê bû kovara Hatawî Kurdistan.

**3-Rojnama Kurdistan:** Di navbera salên 1915-1916'an de ji aliyê Husênê Mikriyanî ve, li Paravê Heleb dihat weşandin.

**4-Rojnama Jîn:** Di navbera salên 1917-1918'an de li Qahîrê ji aliyê Sûreya Bedirxan ve dihat weşandin. Di heman demê de li Stenbolê jî rojnameyek binavê Kurdistan dihat weşandin.

**5-Kovara Pêşketin:** Kovarek heftane bû, sala 1916'an heya 1919'an li Silêmaniyê berdewam kir.

**6-Kovara Kurdistan:** Kovarekî wêjeyî ya heftane bû. Di sala 1917'an de li Stenbolê ji aliyê Mihemed Mehrî ve dihat weşandin.

**7-Kovara Jîn:** Kovarek çandî û wêjeyî ya heftane bû ku ji aliyê rewşenbîrên Kurd ve, di sala 1919'an de, li Stenbolê dihat weşandin.

**8-Kovara Bangî Kurdistan:** Di sala 1914'an de Cemaledînê Baban bi zimanê Kurdî û Tirkî diweşand. Mijarên wê ayînî, çandî, dîrokî û çandinî bû.

**9-Rojnama Pêşkeftina Silêmanî:** Mustefa Paşa li sala 1920'an de li Silêmaniyê diweşand.

**10-Kovara Rojî Kurdistan:** Kovarekî konevanî û heftane bû. Di sala 1922'an de li Silêmaniyê dihat weşandin. Ew kovar ji sazûmaniya Şêx Mehmûdê Berzincî bû.

## HELBESTA QEDRÎCAN

Ax welato ax welato
Roja me zû lêhato
Bav û birên me çawanin
Çima xeber jê nehato

Îşev min dît xewnek bi tirs
Tu keremke ji min bipirs
Ez carekê despêbikin
Da tu bibîn çiqas bihêrs

Bayekê reş hate ji jor
Li ser min kire borebor
Bigirîn da kaxezek sor
Di nav hebûn du tayên por

Ez çûme cem pîrek zeman
Min got falkê vekî eman
Min daye der ev ruh û can
Derdê min re bibî derman

Pirê bû min rabû ser xwe
Piyana avê daber xwe
Li avê xwend, li min nêrî
Dîsa serê xwe daber xwe

Kaxez bixwîna biran bû
Her du ta porên xwihan bû
Mana wan kur û giran bû
Ji fala pîrê nihan bû

Birayên me têne kuştin
Bixwînên xwe têne şûştin
Xwihan porê şandin
Yanî çima hûn rûniştin

Îro laşê min pir dêşe
Qenç dizanim ji çi dêşe
Lê çi bikim derman nîne
Talii tune bextê reş e

Derman go ez kifş dikim
Bihêvîna xwe geş dikim
Ji dilbirînên wek xwe re
Pelên hewarê reş dikim

Qedrî bibêj û binale
Şînê girêde, bikale
Namûs nema rûmet nema
Ev çi derd û ev çi hale

## JÎNAMEYA QEDRÎCAN

Navê Qedrîcan yê rast Evdilqadir Ezîz can e.
Nasnameya wî ya xwendinê weke Qedrî ‘Ezîz can e. Navê diya wî ‘Eyşê ye. Ji xelkên Dêrika çiyayê Mazî ya girêdayî bajarê Mêrdînê ye. Lê bi xwe tenê ji xwe re Qedrîcan gotiye. Di sala 1911’ê de li Dêrika Çiyayê Mazî ji dayîk bûye. Zarokatiya xwe li wir derbaz kiriye. Xwendina dibistana seretayî li Mêrdînê pêkaniye. Dibistana Navîn li gel Reşîdê Kurd li Amedê xwendiye.
Piştî wê derbazî bajarê Konayê dibe û li wir dest bi xwendina dibistana Mamostatiyê dike. Çend sala vê xwendinê didomîne û havîna tê welat. Bi hêsanî cudahiya di navbera bajarên Kurdan û Antolyê de dibîne. Bi sedemên nexwendin û qedexebûna zimanê Kurdî jî dihesibîne.
Piştî têkçûna Serhildana Şêx Seîd Dewleta Tirk rewşenbîrên Kurd û malbatên welatparêz dişopîne; Qedrîcan jî ji vê rewşê para xwe digre û tê şopandin. Ev rewş bû sedem ku li sala 1927-28’an nikare bixwîne, nikare destûrnameyê jî bistine û piştî demekê bi hinek hevalên xwe yên weke Reşîdê Kurd re derbazî Amûda Rojavaya Kurdistanê ya ku di wê demê de dibin destê Franse de bû dibe.
Qedrîcan di hejmara pêşî ji kovara HAWAR’ê re nivîsîn nivîsîye.
Qedrîcan gelek xebatên giranbiha bi şûn xwe ve hiştin û gelek xebat li benda wî bû. Mixabin ruhstên destûr neda. Di

temenê 61 saliya xwe de, di sala 1972'an de li Şamê koça dawî kir û li wir hat veşartin.
Li ser gora wêjevanê Kurd yê hêja wiha hatiye nivîsîn:

Qedrîcan gelek girîngî daye li ser helbestên razber.
Mînak:

"Camêrê di vê gorê de
Zor nazik û ciwan e
Ji Dêrika çiyayê Mazî
Navê wî Qedrîcan e

Hezar xwezî l'gora wî
Hozanekî Kurd e
Welatparêzekî qenç bî
Ruhstîn jê girt can e

Gorê xiste zikê xwe
Ew jî kire qurban e
Ji pişta me Kurdan çû
Ev zanayê ziman e"

## GULA SOR

Gula sor
Hilbû jor
Bêhn da dor
Gula sor.....
Gula sor li paş çiyayê Qaf şîn bû,
Alem jêre evîn bû,
Gula sor
Bi me xweş,
Da me hiş,
Em bi bêhna wê sermest,
Emê pê şabin serbest,
Nazalînî.....
Xemrevînî,
Pê zemîn
Guleke bê kelemî,
Di nav baxê îremî,
Gula sor em li dor
Bicivin
Bîn bikin
Dor bi dor

## ZANISTÊN WÊJÊYÎ

Helbesta li jor hatî xwendin helbestek Dramatîk e. Ji ber ku bûyerek êşbar û tirsnak aniye ziman, li aliyê din ev helbest dikare weke şano jî bê sazûman kirin.

**7. Helbesta Sembolîk**; ew helbestên ku di mijara "hûnerên gotinê" de ji hûnera gotinê ya nûnertiya istiareyê re weke mînak tê dayîn helbestên sembolîk in.

Heyînek weke sembola wê heyîna ku qest pê vegotina wê ye, tê bijartin. Taybetmendiyê bingehîn yên wê heyînê bi wê sembolê tê vegotin.

**LÊKOLÎN**

1. Qedrîcan kengê û li kuderê koça dawî kiriye.
2. Hûn jî helbestek ya Qedrîcan peyda bikin û li lênûsa xwe binivîsin.
3. Helbestek Dramatîk binivîsin.

## HELBESTA CASIMÊ CELÎL

### SINGA ÇIYÊ

Ji singa çiyê av tê xwarê
Ava belekiya berfê
Ez heyrana xala çengê
Lê bedewê lê canê

Elbekê tejî ke ji wê avê
Bireşîne ser gulê darê
Bila bêhna miska wan bê
Lê lê canê min heyranê

Car din avê bi elbê bîne
Dilê min agire agir tîne
Bi ava elbê tu vê sîne
Lê lê canê tu bilezîne

Ez şivanim li serê çiya
Tu xezalî best û zeviya
Lê lê canê te hingavtim
Te hingavtim bi çav birûya

## JÎNAMEYA CASIMÊ CELÎL

Casimê Celîl di sala 1908'an de, li gundê Kuzilkuleya navçeya Dîgora girêdayî bajarê Qersê ji dayîk bûye.
Li Dîgorê Kurd û Ermenî bi hev re dijîn.
Casimê Celîl zarokatiya xwe ji pênç salî û pêve di nav şer de derbaz dike. Bi taybet dema Casimê Celîl derbazî Êrîvanê dibe; li wir rastî sifira amadekirî nayê. Lewra di demê çûyînê nekarîn xwarin, kinc, nivîn, pez û dewaran bi xwe re bikin ku bihêsanî çend rojan bikarin debara xwe pê bikin.
Di wan deman de Yekîtiya Sovyetê hêj Ermenîstan nedabû nava xwe. Ji ber van sedeman birçîtî, belngazîtî û bêxweyîtî pir zêde bû. Ev kesê giranbiha bi şevan ji devre radike û birçî dimîne. Piştî Ermeniyekê xêrxwaz û dostê Kurdan li rastî wî tê û wî dibe radestî sêwîxaneyê dike. Ev wêjevanê hêja ji aliyê sêwîxaneya Gonî ve tê xweyî kirin û perwerde kirin. Ji bo ku bi rewşek rêkupêk bikêrî gel û çanda xwe were, gelek dixebitiya. Di temenek biçûk de gelek navendên çanda Kurd ji gelê xwe re damezrandine. Di temenê 23'ê saliya xwe de, 1931'ê bû rêveberê komela Kurdan. Di wê xwendingehê de bi sedan keç û xortên Kurdan dixwendin û karê cıvata xwe dikirin.
Casimê Celîl ji malbatek Kurd û xêzan hate Cîhanê. Li gorî wê jî bi rewşekê wisa gihişt ku têra gel û herêma xwe kir. Navê gihişte asta herî jor. Temenê wî jî gelek zêde bibû û gihiştibû 90'ê. Lê gelê wî ji xebata wî têr nedibû. Dixwest hêj

gelek di nav wan de bimîne. Lê roja 24. 10. 1998’an koça dawî kir.

## ZANISTÊN WÊJEYÎ

Helbesta bi navê “***Singa Çiyê***” ji ber taybetmendiyên xwezayê aniye ziman, helbestek Pastoral e.

**LÊKOLÎN**

1.Casimê Celîl di kîjan temenî de ketiye nava şer?

2. Hûn jî helbestek pastoral peyda bikin û di refê de bixwînin.

## HELBESTA HEJAR

### Kurd Bêkes Nîne

Rojî xoşit hate aso ey gelî xembarî Kurd
Roj helat roşîn deke şewarî taltarî Kurd

Kotrî pîkaso ke mujdey hêmînî hêîn gotî
Mird be ser çû rojî îstîbdad istismarî Kurd

Kewt lerze tembelî xayîn be gel mêşk û dilî
Tunde rîsey dakuta hêzî prolaterî Kurd…

## JÎNAMEYA HEJAR

Hejar nasnavê wî ye. Navê wî yê rast Ebdurehman Şerefkendî ye. Sala 1921'an li bajarê Mihabadê ji dayîk bûye.
Ji ber ku bavê wî mela bû, di biçûkahiya xwe de, li cem bavê xwe hînî xwendinê bûye. Bi jiyana netewa Kurdî ve girêdaye. Di navbera salên 1941-1947'an de leşkerê Sovyetê ketîbû Bakurê Îranê, di wê demê de zordariya şahê Îranê li ser gund û bajarên Kurdan berdewam bû. Lê ji ber şêlûbûna Rojhilata Navîn, hemû kesayetên Kurd bi taybet yên xwendevan û şoreşger şiyar bibûn, kom û komele ji bo serxwebûna Kurdistanê sazkirîbûn. "Evdurehman Şerefkendî" heman bîr û baweriyên welatparêziyê di serê wî de hatibûn çandin û dest bi helbestên Kurdewarî kirîbû. Rewşa wî ya aborî belengaz û hejar bû, ji ber belengaziya xwe û zordariya li ser gelê Kurd dihat kirin, navê xwe danîbû Hejar. Destpêkê bi alîkariya rewşenbîrên Komara Mihabadê pirtûka helbestên Hejar li Mihabadê hat çapkirin. Bi rûxandina komara Mihabadê re Hejar neçarî koçberbûnê bû, ji ber zordariya Şahê Îranê koçberê Îranê bû. Gelek berhemên hûnandî û pexşanî dafirîne û karê rewşenbîrî, welatparêzî rêve dibe û pê şanaz dibe.
Hejar di 21 sibata 1991'ê koça dawî kiriye.

## ZANISTÊN WÊJEYÎ

Taybetmendiya herî girîng û bingehîn ya helbestê rêzik e. Rêz di helbestê de dibe koma gotinan. Di her rêzek ya helbestê de wateyek heye.
Rêzik parçeya herî biçûk ya helbestê ye.
Tixûb ji rêzên helbestê re tune. Dibe ku helbest du rêz be û dibe ku jig elek rêzan pêk were.

**LÊKOLÎN**
1. Hejar kengê ji dayîk bûye?
2. Hûn jî çend taybetmendiyên helbestê peyda bikin.

## HELBESTA KAMURAN ELÎ BEDIRXAN

### XATIR XWAZIYA MEMÊ

Mem got dê kerem ke ezbenî tu
Dêka minî tu, ne bayî wek du

Qedrê te erê gelek girane
Mem derdê dêyan gelek dizane

Ser pêsîr û sing û paşila te
Germî ku dida tênî dilê te

Dadê tuyî tu, tu dayîka min
Destê te hejand mehdika min

Alosî erê, erê tu dêyî
Fêkê  te me ez tu dar û rê yî

Dadê negrî Xudê piyare
Lawê te ye Mem ji dê re yare

Makî erê tu, tuyî dilovan
Lingê te de Mem peşî be qurban

## JÎNAMEYA KAMÛRAN ELÎ BEDIRXAN

Mîr Kamûran Elî Bedirxan neviyê Bedirxanê Begê Mîrê Cizîra Botaye. Kurê Mîr Emîn Elî Bedirxane. Kamûran li sala 1895'an li Stembolê ji dayîk bûye.

Piraniya zarokatiya xwe li wir borandiye. Weke gelek zarokên Bedirxaniyan bi awayek tekûz hatiye perwerde kirin.

Kamûran Bedirxan temenê xwe yê watedar û dirêj di riya azadî û wêjeya gelê xwe de borandiye.

Kamûran Bedirxan li zanîngeha bilind ya Stembolê û di fakûlteya Hukukê de xwendina xwe pêkaniye û bûye parêzerekî maf zan. Piştre derbazî Elmaniyayê bûye û li wir doxtora xwe da; bû doxtorê hukukê.

Ji ber xebatên wan yên giran biha dewleta Tirk êrişên bêhmpa li ser malbatê didomînin û ew û birayê xwe Celadet Bedirxan li sala 1930'ê derbazî Rojavayê Kurdistanê bû. Li wir xebatên xwe yên giran biha berdewam kirin û bû nivîskarê kovara Hawar.

Kamûran Bedirxan li sala 1978'ê li Parîsê koça dawî kiriye.

**Berhemên wî:**

*Tefsîra Quranê, xwendina Kurdî*
*Waneyên Şîreetê*
*Helbestên Kurdî*
*Berfa Ronahiyê*
*Rêzimana Kurdî*

*Elfabaya Min*
*Zimanê Kurdî*
*Parçeyên Bijarte*
*Gramera Kurdî*
*Zimanê Mader*
*Despêka Xwendinê*

## ZANSITÊN WÊJEYÎ

Di helbestan de beş hene. Her beşek ji çend rêzên hejmarî pêktên. Dema beşek ya helbestê ji b odu rêzika pêk were navê dibe beyt-malik.
Eger hêjmara rêzên beşek ya  helbestê çar rêz bin, navê wê dibe çarik.

**LÊKOLÎN**
1. Kamûran kengê koça dawî kiriye?
2. Hûn jî hin taybetmendiyên helbestê binivîsin.

## KOVARA HAWAR

Piştî têkçûna gelek serhildan û şoreşên Kurdî, mîr Celadet Bedirxan û birayê xwe Kamiran digihên wê baweriyê ku Kurd û Kurdistan tenê bi hilgirtina çekan ji nîrê bindestî û nezaniyê rizgar nabin. Li rex mêrxwasiyê pêdiviya Kurdan bi şoreşeke çandî û zanînê heye, lewma mîr Celadet dest bi weşandina kovara "Hawar" ê kir. Di sergotara hejmara yekê de wiha hatiye:

*"Hawar dengê zanînê ye. Xwe nasîn ji me re riya felat û xweşiyê vedike. Her kesê ku xwe nas dike; dikare xwe bide nas kirin. Hawara me berî her tiştî heyîna zimanê me dê bide naskirin. Lewma ku ziman mercê heyînê ya pêşiye."*

Helbet wek em tev dizanin ku berî çapkirina Hawarê, bi çend salan mîr Celadet bi Alfebeya Kurdî ya bi tîpên latînî ve xerik bibû û bi weşandina Hawarê re belav kir. Eva he jî cara yekem bû ku Kurda dest bi nivisandina tîpên latînî dikir, roja îro çaran sêyê gelê Kurd van tîpan bikartîne.

Hejmara pêşin ya vê kovarê di 15 Gulana 1932´an de, derket. Her du heftiyan carekê ev kovar derdiket. Hejmara dawî (57) di 15´ê Tebaxa 1943´an de, derketiye. Hemî hejmarên vê kovarê di bin serpereştiya mîr Celadet û li bajarê Şamê li Çapxana Kerem çap bûne. Ev kovar li Şam, Cizîr, Efrîn û Kobanê bi giştî belav dibû. Hejmarin hindik jî li Başûrê welat, Bexdadê û hin dewletên din dihat belavkirin wek Urdin û Misirê.

Celadet Bedirxan bi gelek navan di Hawarê de nivîsên xwe belav kirine. Her wiha nivîsên Osman Sebrî, Qedrîcan, Cegerxwîn û gelekê dîtir cihê xwe di vê kovarê de girtine.
Ji carekê zêdetir hemû hejmarên kovara Hawarê li Ewrûpayê ji nû ve hatine çapkirin.

## SIRÛDA DILDAR

### EY REQÎB

Ey reqîb her maye qewmê Kurd ziman
Naşikê û danayê topî zeman
Kesnebê Kurd dimirin
Kesnebê Kurd dimirin
Kurd jîn dibin
Jîn dibe qet nakeve Ala Kurdan
Jîn dibe qet nakeve Ala Kurdan
Ême xortên rengê sor û şoreşin
Seyr bikin xwîna wî ya rabirdûman
Kesnebê Kurd dimirin
Kesnebê Kurd dimirin
Kurd jîn dibin
Jîn dibe qet nakeve Ala Kurdan
Jîn dibe qet nakeve Ala Kurdan
Ême xortên medya û Keyxusrewîn
Dîn îman û ayînman her nîştîman
Dîn îman û ayînman Kurd û Kurdistan
Kesnebê Kurd dimirin
Kesnebê Kurd dimirin

Kurd jîn dibin
Jîn dibe qet nakeve Ala Kurdan
Jîn dibe qet nakeve Ala Kurdan
Lawê Kurd rabûye ser pê wek şêran
Ta bixwîn nexşîn bikin taca jiyan
Kesnebê Kurd dimrin
Kesnebê Kurd dimirin
Kurd jîn dibin
Jîn dibe qet nakeve Ala Kurdan
Jîn dibe qet nakeve Ala Kurdan
Xortên nû tev hazir û amadene
Canfîda ne canfîda her canfîda
Kesnebê Kurd dimirin
Kesnebê Kurd dimirin
Kurd jîn dibin
Jîn dibe qet nakeve Ala Kurdan
Jîn dibe qet nakeve Ala Kurdan

***Yûnûs Raûf (Dildar)***

## JÎNAMEYA DILDAR

Ev sîroda me ya netewî dema Dildar nivîsandî, bêhtirê xwe hestên gel yên azadiyê û qêrîna gel li hember dagirkeriya çînên desthilatdar li ser gelê Kurd dayî sepandin aniye ziman.
Raûf Dildar dema ev sîrod nivîsî bêhtirê xwe dibin hestên netewî de maye û li ser hestên netewî bang kiriye.
Bi taybet weke ku di malika yekem de, hatî diyarkirin;
“ Ey reqîb her maye qewmê Kurd ziman
Naşikê û danayê topî zeman”
Bêhemberbûna gelê Kurd û zimanê wî rave kiriye.
Ticaran zimanê gelê Kurd neketiye yanî bi dirêjahiya demê re hebûna xwe parastiye û winda nebûye.
“Ême xortin rengê sor û şoreşîn
Seyrbikin xwînawiya rabirdûman”
Em ciwanên bi rengê xwînê û şoreşê ne, temaşe bikin boriya me tev bixwîne.
“Ême xortên Medya û Keyxûsrewîn
Dîn îman û ayînman her nîştîman”
Em ciwanên împeretora Keyxûsrewîn, ol û baweriya me, ayîna me her welat e.
“Xortên Kurd rabûne ser pê wek şêran
Ta bixwîn nexşîn dikin taca jiyan”
Ciwanên Kurdan rabûne ser pê wek şêran ta bi xwînê bixemlînin taca jiyanê. Yanî bi şerî aştiyê bînin.
“Xortên nû tev hazir û amade ne

Canfîdane canfîda her canfîda
Di vê malikê de jî ji bo nûbûnê amadebûn û giyan goriya xortên Kurd şirove dike.
“Kesnebê Kurd dimirin
Kurd jîn dibin
Jîn dibe qet nakeve Ala Kurdan”
Di her dawîbûna malikekê de, ev dûbareya li jor tê dûbare kirin. Jiyanbûna gelê Kurd neketina Ala Kurd û berdewamkirina wê bi mîsoger rave dike.
Yûnis Reûf Dildar kûrê Hedîm Sicadiye. Li sala1918’an li Koysenceqê ji dayîk bûye. Xwendina xwe li Koyê û Kerkûkê bidawî aniye, piştî wê li zankoya Bexda xwendiye û bûye parêzer. Dildar hozanvanekî rewşenbîr û şoreşger bû. Di avabûna Komara Mehabadê de cih girtiye.
Di temenê xweyê sih salî de ji ber rawestana dil çûye ber dilovaniya Yezdan. Sala 1946’ê Siroda Netewî “Ey reqîb” ji vehûnandiye.

## ZANISTÊN WÊJEYÎ

**Têbînî**: Nabe ku em her helbestekê tenê di cûreyekê de sînor bikin. Dibe ku helbestek hem pastoral be hem jî lîrîk be.

## HELBESTA TÎRÊJ

### Ey Welat

Ey welat ez canfidayê deşt û zozanê te me
Canfidayê av û dehl û bax û bostanê te me

Sond û peyman bî li ser min dê te parêz kim welat
Xwîna narincî birêjim merdê pê canê te me

Dest li ser darê tiving im çok ji erdê nabirim
Pasîban û leşkerê armanc û nîşanê te me

Can bisojim dibe pêt û agirê cenga welat
Agirê Zerdeşt e ez bi xwe perwanê te me

Bostekî ez ji te nadim bi welatê Hind û Çîn
Tu bihişta îrem î ez sûr û gerdana te me

Dê bibirim ez bi şûr û xincaran destê çepel
Roja cengê tu dizanî xort û Kurdanê te me

Dijê qada te bi der kim ez neyar û dijminan
Hem binyat û esasê birc û eywanê te me

Di bin hêz û hinara xwe ez te parêz kim welat
Ala rengîn jor ve hildim li ser banê te me…

## JÎNAMEYA TÎRÊJ

Tîrêj li sala 1922'ê li gundê Nicimê girêdayî bajarê Qamîşlo ji dayîk bûye. Navê wî yê rast Nayîf e. Xwendina xwe li heman derdorê tekûz kiriye.

Wêjevanek stêrkeka geşe di ezmanê hûner û wêjeya Kurdî de. Şanek teyisiye di kûahiya deryaya çand û helbesbtên klasîka Kurdî de.

Gelek berhemên bi nirx nivîsandine û bûye şopgirê azadîxwaziya gelê xwe.

Hemdemê Cegerxwîn, Reşîdê Kurd e. Helbestên wî piranî girêdayî netewparêziyê ne.

Ev wêjevanê hêja li sala 2000'ê çûye ber dilovaniya Yezdan.

## ZANISTÊN WÊJEYÎ

Ji kesên ku helbestan dinivîsin re helbestvan yan jî hozanvan tê gotin.

**LÊKOLÎN**

1. Tîrêj kengê û li kûderê ji dayîk bûye?
2. Hûn jî helbestek sembolîk binivîsin.

## HELBESTA MELE HESEN

### Awayê Evînê

Ma dizanî aşiqan dîlber xiyale şev û roj
Wer dinalin xwîn dimalin we ji çavan şev û roj

Dil gîrên dema evînê wan jî nedî ve gotiye
Goftûgoyên zilf û xalan dane zanîn şev û roj

Me bi tenê dîlberek divaye yara bê ten û gihan
Ew sirûşta zende gave lendika me şev û roj

Bihişt û zende gihane wê di cîhan daye der
Wê j ime sedil revaye em li bendê şev û roj

Qenc û naze, teng û daze padîşahek bê wefa
Her dema bersiv dixwaze minetkarim şev û roj

Berfa yarê ji xwîna me nivîsî xêze xêz
Soz û peyman me dida wê olperestim şev û roj

Karê meşûqan wihaye aşiqan erzan didin
Wan bi xişmê dil hewaye xwîn dirêje şev û roj

Sorgulan bilbil divaye xişmê seywan lê veda
Ma li ser lat û zinaran tim şiyare şev û roj

## JÎNAMEYA MELE HESEN

Navê vî wêjevanê hêja Hesen e. Ji ber ku Melatî xwendibû digotin Mele Hesen yanî Mele Hesenê Kurdî lê di nava gel bêhtir weke Melayê Hişyar dihat naskirin. Seydayê Hişyar di sala 1907’an de li gundê Serdêya Liceya Amedê ji dayîk bûye.

Wek hemû Melayên Kurdistanê piştî qedandina Qurana pîroz, li gelek Hucreyên cûr be cûr yên Kurdistanê xwendiye.

Dema xwendina wî li ber dawî anînê bû, temenê wî 18 salî bû, bizava Kurdistanê ya di bin serokatiya Şêx Seîdê kal de despêkir. Seydayê Hişyar ji hucreyê derbazî nav şoreşê dibe û çek davêje milê xwe. Dikeve nav cenga giran. Seydayên Hişyar li gel çend hevalên xwe yên jîr, di navbera Dêra hînê û Licê de cengeke bêhempa ya dijwar pêk di anî. Hineka ji vê cenga wan re cenga Efsanewî digotin.

Di sala 1927’an de hate girtin û sezayek mezin jêre hat dayîn.

Seydayê Hişyar li sala 1956’an de bi hin xortên welatparêz re komelaya civaka çanda Kurdî didamezrîne. Seydayê Hişyar li sala 1985an de, di temenê 78’an de koça dawî dike.

Li nav goristana Dugurê li nav gorên Kurdên rojava hatiye veşartin.

## ZANISTÊN WÊJEYÎ

### Helbesta Kurdî

Ronî û eşkere ye ku berî îslamê helbest bi zimanê Kurdî hatine hûnandin. Helbesta Kurdî serê xwe di gelek dargehan de rakiriye. Gelek şûn û war dîtiye. Beşa Awestayê ya bi navê "Gata yan Gatan" hemû bi awayê helbest û kiteyî hatiye nivîsin. Niha jî ew awayê helbest gotinê di nava Kurdan de heye. Di Awestayê de bi taybetî helbesta deh kiteyî tê dîtin. Helbestkarên Kurd jî piraniya helbestên xwe li ser kiteyan nivîsîne. Li gor van belgeyên di destê me de derdikeve holê ku berê îslamê di nava gelê Kurd de gelek helbestvan derketine ku bi Kurdî helbest ristine.

Helbestên Kurdî li ser pênç mijaran hatine hûnandin.

1.Şer

2.Dildarî û evîndariyê

3.Ayînî û olî

4.Mînandinê

5.Xwezayê

**LÊKOLÎN**

1.Li gorî we helbestên Melayê Cizirî dikevin kîjan beşê?

2.Hûn jî helbestekî li ser xwezayê hatî nivîsandin peyda bikin.

## GOTINA MUSA ANTER

Ez şahidê zindî û sondxwarî yê tengasiyên Tirkiyê yê 55 sala me. Gelo ez tenê şahid im? Na! Ez her wiha mehkûm, bersuç û dozdarê Tirkiyê me."

## JÎNAMEYA MUSA ANTER

Musa Anter di sala 1920’an de, li gundê Zivinga Stilîla navçeya Nisêbînê ya girêdayî Mêrdîn hatiye dinê. Wî hîn di temenekî biçûk de, bavê xwe winda kir û li ber destên dayîka xwe ku muxtara gund bû, mezin bû. Apê Mûsa dibistana xwe ya seretayî li Mêrdînê û ya navîn û Amadeyî jî li Edenê qedandiye.
Piştî xwendina amadeyî ji bo felsefeyê bixwîne, diçe Stenbolê û di zanîngehê de, gelek xwendekarên Kurd nas dike. Musa Anter, li ser daxwaza Fayiq Bucak dev ji felsefeyê diberde û qeyda xwe li beşê Huqûqê çêdike. Di wê demê de xwendekar û rewşenbîrên Kurd ji bo pirsgirêka neteweyî dikevin nava tevgerê. Her wiha Apê Mûsa ji bo ku xortên Kurd li dora xwe kom bike û hem ji aliyê madî ve, hem ji aliyê rewanî û siyasî ve xwedî li xwendekarên Kurd derbikeve Mala Dîcle vekir.
Piştî salek jî li gel hin hevalên xwe komeleya Hêvî ava kir, bi pêşniyaza van kesan komeleya xwendekaran tê damezrandin.
Di sala 1944’an de bi keça Evdirehman Zapsu Halê re dizewice û ji wan re 2 kurên bi navê Anter û Dîcle û keçek bi navê Rewşen çêdibin.

Musa Enter di sala 1948’an de Mala Firatê vedike û dest bi deranîna rojnameya çavkaniya Dicleyê dike. Piştî çend salên dirêj li Amedê bi navê "Ilerî Yurd" yanî welatê pêşketî dest bi deranîna rojnameyekê din dike û ew ji ber nivîsên xwe jî ji bo demekê tê gitin.
Di sala 1959’an de ji ber doza 49’an careke din tê girtin û tevlî 49 hevalên xwe 6 mehan di girtîgehê de dimîne. Mûsa Anter pirtûka xwe ya bi navê "Birîna Reş" di zindanê de dinivîsîne. Her wiha ferhenga Kurdî ya bi 6 hezar peyvan pêkhatî, amade dike.
Di destpêka salên 60’î de, di nava Partiya Çep ên Tirk de, bi awayekî fermî dikeve nava siyasetê. Musa Anter, piştî sala 1971’an careke din vedigere Kurdistanê û li Amedê ji hêla hêzên dewletê ve tê girtin û bi 4 salan cezayê girtîgehê tê tewembarkirin. Ronakbîrê Kurd Mûsa Anter di sala 1976’an de piştî serbestberdana ji zîndanê vedigere gundê Zivingê û jiyana xwe li wir berdewamdike. Li gundê xwe, heta 1989’an dimîne.
Piştî 89’an vedigere Stenbolê, di gelek kovar û rojnameyan de, ji nû ve dest bi nivîsandinê dike û di heman demê de, di nava Partiya HEP’ê de ji nû ve dikeve nava siyasetê. Her wiha Apê Mûsa di gelek rojname û kovarên mîna Welat, Ülke, Ozgur Gundem û Ozgur Ulke de nivîsên xwe diweşîne, nivîsînên wî ji aliyê xwendevanan ve bi balkêşî dihatin xwendin.

Roja 20 Îlûna sala 1992’an li kolanên Amedê di kesayeta wî de dijminan çapemenî û ramana azad kirin armanc û Musa Anter bi êrişekê bêbextiyane tevlî kerwanê şehîdên çapemeniyê dibe.

Xelatên Rojnamegeriyê

Li Tirkiyê ji 1993'an şûnda Xelatên Rojnamegeriyê ya Mûsa Anter û Şehîdên Çapemeniyê tên dayîn.

Xelatên Rojnamegeriyê ya Mûsa Anter û Şehîdên Çapemeniyê cara despêkê di sala 1993'an de ji aliyê Ozgur Gundem, piştre 1994'an Ozgur Ulke, 1995'an Yenî Polîtîka, 1996'an Demokrasî, 1997 û 1998'an Ulkede Gundem, 2000'an Yenî Gundem û sala 2001'an jî ji aliyê Yedîncî Gundemê ve hatibû dayîn

Berhemên Wî

Birîna Reş - 1959

Ferhenga Kurdî - Istanbul, 1967

Hatıralarım, cîld 1 - Istanbul, 1991

Hatıralarım, cîld 2 - Istanbul, 1992

Çinara Min, Istanbul, weşanên avesta

**ZANISTÊN WÊJEYÎ**

Wêjevanê me yê hêja Musa Anter ji berhemên hûnandiyê zêdetir piranî berhemên xwe bi awayek pexşan nivîsandiye.

**LÊKOLÎN**

1.Hûn jî çend gotinên Musa Anter peyda bikin û bixwînin.

2.Musa Anter kengê û li kûderê koça dawî kiriye?

## HELBESTA MIHEMED ŞÊXO

### Welatê Min

Welatê min şîrîne, wekî baxan
Gelê mine dikêşe, wekî şaxan
Welatê minî, şîrîn Kurdistan
Ew bûka cîhanê ya hemû çaxan
Dijmin girt ser welatê min bi zorê
Li çar hawîr lê dixistin bi dorê
Mayîn danîne li nav parçekirin
Rêberên me bihezaran serjêkirin
Zikê xwişk û diyên me diçirandin
Zarok tev di pêçkan de şewitandin
Laşê nazik di zindanan de rizandin
Xortên nû hatî hemû daleqandin

## JÎNAMEYA MIHEMED ŞÊXO

Mihemed Şêxo li sala1948'an li Qamişloyê ji dayîk bûye, xwendina xwe ya seretayî li wê derê temam dike û di navbera salên 1962-1972'an ji bo xebatên hûnerî li Lubnanê dimîne. Di sala 1968'ê de dest bi stran got û lêdana temûrê dike. Her wiha dest bi folklora Kurdî jî kir. Di vê derê de bi dengê xwe yê zelal navdar dibe. Li sala 1973'an derbazî Başûrê mezin dibe û xebatên xwe li wê derê didomîne. Piştî têkçûna şerê Başûr, derbazî Rojhilatê Kurdistanê dibe û li sala 1983'an dizivire Qamişlo.
Piştî vegera xwe hîn pitir êş û derdên gelê Kurd dibîne û pitir helbestên xwe evîndariya rast û heskirina welat tîne ziman.
Mihemed Şêxo li sala 1989'ê li Qamîşlo koça dawî kiriye.
Mihemed Şêxo 14 berhemên wêjeyî yên bi nirx ji bo gelê Kurd nivîsîne.

**LÊKOLÎN**
1. Di malika yekemîn ya helbestê de, helbestvan xwestiye çi bîne ziman?
2. Di rêzika "zarok tev di pêçikan de şewitandin"de dixwaze çi rave bike?
3.Berhemek yê Mihemed Şêxo lêkolîn bikin.

## TÊKILIYA WÊJEYA KURDÎ Û WÊJEYA CÎHANÊ

Weke tê zanîn xaka Kurdistanê di xaknîgariya cîhanê de, xwediyê cihekî girîng e. Di pêvajoya dîrokê de gelê me li ser vê xaka pîroz dijî.
Bazirganiya di navbera sê parzemînên mezin de (Asya, Awrûpa, Efrîqa) pitirînê xwe li ser Kurdistanê re tê kirin.
Ji ber stratêjîkbûna Kurdistanê, Kurdistan herdem bûye qada cengên weke ya Îskenderê Mekedûnî, cenga di navbera împaratora Fars û Rom, Sasanî û Osmaniyan de. Ev ceng û bazirganî bûne sedem ku têkîliya di navbera gelê Kurd û gelê Cîhanê de pêşbikeve û vê têkîliyayê hiştiye ku wêjeya Gelê Kurd bandora xwe li ser wêjeya Cîhanê û derdorê çêbike. Her wiha ji wan jî bandor bibe.
Dîsa di dema împaratoriya Medan de ji ber ku pirtûka pîroz Awesta bi zimanê Medî bû, bibû bingehê herî girîng ji bo wêjeya Rojhilata Navîn. Her wiha piştî dagirkirina Kurdistanê ji aliyê dagirkerên Kurdistanê ve têkîlayî zêdetir bû.
Bi van boneyên hatîn diyarkirin, tê zanîn ku têkilî di navbera wêjeya Kurdistanê û wêjeyên Cîhan de heye.
Ji ber ku dibêjin wêje mîna avê ye; dema av li ser erdekê re diherike, axa wê derbazî li ser axa din dibe. Her wiha dema wêjeya netewekê di nava neteweke din re bi herike, hinek wêjeya wî di nava wê netewê de dimîne, her wiha hinek ji wêjeya wî jî bi xwe re dibe.

Ji ber vê yekê em dibêjin wêjeya gelê Kurd hem wêjeya Cîhanê bandor kiriye û hem jî bandor bûye.

**LÊKOLÎN**

1.Têkîliya di navbera wêjeya Kurdî û wêjeya cîhanê de çiye?

2.Çavkaniya wêjeya Cîhanê kîjan wêjeye?

## ŞILLÎ

Şilî yeke ji navdarên Îngiliz e. Navê wî yê rast Pîrsî Bayîş’e . Li sala 1792’ê ji dayîkbûye û di sala 1823’ê koça dawî kiriye . Şilî yeke ji helbestvanên herî bi nav û deng ku di dibistana romantizma helbestê de. Wî li zaningeha Oxfort’ê xwendiye û gihiştiye pileyek berz di zanist û wêjeyê de. Li sala 1821’ê çûye Îtalya’yê, Şillî jî wekû tevayî rewşenbir û helbestvanên demê xwe, dest bi derd, êş û jana mirovahiyê kiriye û ji her kesê bêhtir daxwaza serbestî û azadiya mirovahiyê kiriye. Şillî xwedî hizir û bîrek dewlemend û berfireh bû. Ramanên Şilî yê herî girîng we bû ku digot: “Tek dermanê nalebarî û xirabiya dinyayê azadî û hezkirine”. Berhemên herî girîng yên Şilî evin:

Qesîdeya odanîs ku li ser koça dawiya hevalê xwe Kits gotiye.

Posteyek bo şeman her wiha şano nameya Premeteosê azad ku drameke di çar perdeyan de nivîsiye. Nimûneya li jêr ya berhemên Şilî bi destkarî hatiye wergerandin.

***Bilbilekan bi xebere***
***Li ser liq û popî gulin***
***Serxoş û xanebederin***
***Awaneyê arozoyê jiyan***
***Şewq û xoşî li dij neman***
***Yekê xistûn bi xeberin***
***Bê hêz û tên bi xeberin***
***Li wê dê bilbilekî ciwan***
***Awaz û beste bo jiyan***
***Delê be coş û nerm û  nîgan***
***Mandoyî destê xoş û geman***
***Kewte xarê li ser ew nîgan***
***Lawe lawe çire berzeke***
***Baweşî bo girtû tewe***
***Heta hetaye berew neman***

**BI KURMANCÎ**

Li ser şax û çiqên gulanin
Serxweş û ji malbiderin
Ewin hêviya jiyanê
Şewq û xweşî dijî nemanê
Kirin yek şiyarin
Bê hêz û şiyan şiyarin
Li wêderê bilbilek cuwan
Awaz û stiranê bo jiyan
Dibê bi coş,nerm û nazik
Westayê destê xweşî û xeman

Serûser keta xwarê
Lavlavka kurs û billind
Himbêza  xwe jêre vekirye
Heta heta berbi nemanê

**LÊKOLÎN**
1.Şilî kengê û li kûderê ji dayîk bûye?
2.Şilî kengê koça dawî kiriye?

# TESTA 2

1- Navê rojnameya destpêkê ya gelê Kurd çiye û kengî hatiye weşandin?
   a- Kurdî sala 1888
   b- Kurdistan 1898
   c- Kurdewarî 1899
   d- Nîştîman 1898
   e- Kurdisatan 1889
2- Navê Pîremêr yê rast çiye?
   a- Ebdula
   b- Silêman
   c- Mehmûd
   d- Tewfîq
   e- Hemze
3- Helbesta hestiyar ya ku bi zimanekî bi coş û xemgînî tê vegotin re kîjane?
   a- Epîk
   b- Pastoral
   c- Ssatirîk
   d- Sembolîk
   e- Lîrîk
4- Cîhana Ara Xanim kengî hatiye cîhanê û navê bavê wê çiye?
   a- 1859 Mela Neşed
   b- 1759 Mela Resûl
   c- 1959 Mela Reşîd

d- 1659 Mela Qadir
e- 1559 Xemgîn

5- Ji helbestên xwezayê, jiyana şivan, gavanan û... ya di xwezayê de tîne ziman re çi tê gotin?
a- Lîrîk
b- Dramatîk
c- Komedî
d- Satirîk
e- Pastoral

6- Helbesta bi navê “ Dîcle û Firat” ya kîjan wêjevaniye?
a- Cegerxwîn
b- Osman Sebrî
c- Pîremêr
d- Sebrî Botanî
e- Kamuran Bedîrxan

7- Kovara roja Kurd kengî û li kuderê hatiye weşandin?
a- 1907 Stenbul
b- 1913 Silêmanî
c- 1913 Stenbul
d- 1916 Heleb
e- 1918 Qahîre

8- Qedrî Can kengî û li kuderê ji dayîk bûye?
a- 1911 li Dêrika Hemko
b- 1915 li Cizîra Botan
c- 1914 li Batmanê
d- 1911 li Derika çiyayê Mazî

e- 1911 li Bidlîsê

9- Hêjmara pêşî ya Kovara Hewar kengî hatiye weşandin?
- a- 15 Gulana 1932
- b- 15 Nîsana 1933
- c- 15 Adara 1934
- d- 15 sibata 1932
- e- 15 Gulana 1935

10- Mûsa Anter kengî û lî kuderê hatiye qetilkirin?
- a- 20'ê Îlona 1999 Mêrdîn
- b- 20'ê Îlona 1992 Amed
- c- 21' ê Adara 1994 Gever
- d- 22'ê Adara 1995 Şirnex
- e- 16' Adara 1988 Helebçe

| TESTA 1 | TESTA 2 |
| --- | --- |
| 1- A | 1-B |
| 2- B | 2-D |
| 3- D | 3-E |
| 4- C | 4-A |
| 5- E | 5-E |
| 6- D | 6-B |
| 7- B | 7-C |
| 8- A | 8-D |
| 9- B | 9-A |
| 10- B | 10-B |


Derya Res
Gurcistan
Rusya
Ermenistan
Azerbeycan
Tirkiye
KURDISTAN
Nahcevan
Iran
Derya Sipi
Suriye
Lubnan
Iraq
Idir
Qers
Sewas
Erzincan
Erzerom
Bazid
Agri
Mako
Dersim
Cewlik
Caldiran
Eleziz
Mus
Tetwan
Behra Wane
Wan
Qotur
Xoy
Elbistan
Meleti
Farqin
Bitlis
Basqale
Firat
Semsur
AMED
Batman
Sert
Gever
Meras
Besni
Siverek
Merdin
Sirnex
Clemerg
Urmiye
Zaxo
Entap
Riha
Veransehir
Nisebin
Cizir
Nexede
Iskenderun
Qamislo
Dicle
Dihok
Mihabad
Hasakeh
Musil
Bokan
Hewler
Seqiz
Bicar
Kerkuk
Silemani
Merivan
Sine
Helebce
Qesri-Sirin
Kirmansah
Xaniqen
Ilam